

PEYAMA Kurd

Hejmar 63 | 18.11.2005

Kurdish weekly newspaper

Dîplomasi berdewame

■ Serokê Kurdistanê Mesûd Barzanî di dîplomasiya nevnêwî de gavên girîng tavêje pêş û jibo avakirina Kurdistanê pêşerojê hîmên resen (esasî) datîne



Rûpel 7



Hevxebata PDK-Bakur û PSK xurttir dibe

Rûpel 8




Mafê her Kurdekî heye bibe endamê me

Rûpel 9

Serdana Qesra Spî naskirina Kurd û Kurdistanê ye

Rûpel 7



Ji xwezayê agahdariyên taybet Rûpel 2

Li Çewligê xeteriya rûxandinê Rûpel 3

5 hezar cotyar koç kirin Rûpel 3

Rejîma Sûriyê bihevket Rûpel 6

Bajar bi bajar Kurdistan Agirî Rûpel 12

Bîranînek ji Moskowayê Rûpel 14

Hewler de konferansa xoserbiyayîşî Kurdistan viraziyay Rûpel 15

Heinz Fisher pêşwazî Celal Talebanî Kerd Rûpel 16

Malpereke nû ya Kurdî HawarDENGÜBAS.com

HAWAR DENGÜBAS.com
PORTALA WÛCE Û ZANÎNÛ KURDISTAN Û CÎHAN

D 1.50 EUR, A 1.70 EUR, B 1.70 EUR, NL 1.70 EUR, CH 2.60 SFR
LUX 1.70 EUR, I 1.70 EUR, S 19.00 SKR, DK 14.00 DKR,
N 16.00 NOK, GB 1.10 £, GR 1.70 EUR



Dewleta Tirk dev ji har û hovîtiya xwe bernade



Rûpel 5



Gever



Dêrsim



Otomobîla Kontrgerîla



Wan

Kurtenûçe

Gêrikan çavê jinekê xwar

PK - Li Hindistanê gêrikan li nexweşxanekê çavê jinek ku jibo tedawiye li wir bû xwar. Li gor daxuyaniya rêvebirên nexweşxaneyê li Kalkuta jinekê ku jiber nexweşiya şeker emeliyat bûbû piştî ku pêrgî êrişên gêrikan bû di çavê xwe de bi êşekê hesiya û serî li pişîşkan da.

Ziyaretkarên jinekê di 14ê mehê de gava tèn serlêdana meriya xwe bandaja liser çavê wê vedikin û dibînin ku di kortika çavên wê de gelek gêrik dibînin.

Midûrê nexweşxaneyê radigihîne ku êrişkariya gêrikan li dijî nexweşên şeker tiştêkî tebîî ye, lê jibo vê mijarê dest bi lêpirsinê kirine.

Pereyên birka (hewiz) evîne didizin



PK - Li İtalya 4 kesên ku pereyên birka evîne dizin hatin girtin.

Baweriyek wiha heye ku, tûristên piştî xwe bidin kaniya evîne û di ser milên xwe de perê hûr bavêje birkê wê carek din vegere Romayê. Jiber vê yekê her roj bi hezaran tûrist pere davêjin birkê.

Di birkê de her roj bi sedan Euro dikeve ser hev û ev pere ji aliyê firmeyekê tê berevkirin. Nêviyê vî pereyî diçe saziya alikariya Katolik Caritas.

Lê bi taybetî di vê dema dawiyê de wezîfedarên Caritasê pê hesiyên ku pereyê ji birkê tê bi awayekî balkêş kêmtê û jiber vê yekê serî li polis didin.

Di 15ê mehê de 4 kes bi 1200 Euroyê ku ji birkê belav kirine hat girtin. Tê texmîn kirin ku ev 4 kesan heta niha 110 hezar pere ji birkê berev kirine.

Polis di sala 2002an de kesekî di mehê 12 hezar Euro berev dikir girtibû.

Kaniya evîne di sedsala 18em de hatiye çêkirin.

Lêborîn



Me di hejmeta 62an de bi xeletî birêz Yilmaz Çamlıbel wek berpirsiyarê derve ê rojnama Dema Nû nişan dabû. Rastiya wê berpirsiyara derve a rojnama Dema Nû xanim Necla Morsünbül e. Em lêborîne ji Çamlıbel û Morsünbül dixwazin.

Ji xwezayê agahdariyên taybet

PK - Navenda derdora (hawirdor) heremî (REC) di sala 1990an de ji aliyê Komisyona Ewropa û Macaristanê wek dezgehêk serbixwe û bê neta qezenckirina pere hat damezrandin.

Armanca REC ew e ku agahdariyên Yekitiya Ewropayê yên di derbarê hawirdorê de tenê li ser kaxizan nemîne û pêk bêanin.

REC di malpera xwe de di mijara çareserkirina pirsên derdorê de agahdariyên balkêş diweşîne.

Hin agahdariyên di malperê de wiha ne:

Gêrikek dikare giraniyek ji xwe 50 carî bêtir bar bike.


Moz jibo ku niv kîlo huniv çebikin ji zêdetirî 2 milyon çiçekan ava riwekan (nebatan) berev dikin.

Zirkêzik li gel ku ev 250 milyon sale hene, qet nehatine guherandin.

Temenê mêşek gulanê tenê çend seetek e.

Kengurû nikarin bi paşve bimeşin.

Pengûn jibo ku teserûfê ji enerjîyê bike bi hereketên



tewş dimeşe.

Li dinyê li serê her mirovekî 1 milyon gêrik dikeve.

Fîl yekem lawira bi memike ku nikare bipengize.

Çelekek di jiyana xwe de dikare heta 200 hezar qedeh şîr bide.

Gava Pengûnenê me bi kurk dikevin 4 meha xwarinê naxwin.

Li dinyê qasî 1 milyon cûr kêzik hene û her sal ji li dorî 8 hezar cûrên nû kifş dibin.

Kêçek dikare 150 carî ji meziniya xwe bilindtir bipengize. Li gora vî hesabî mirov ji divê karibe 30 metreyî bipengize.

Mîşkek ji hêstirekê (deve) zêdetir dikare ti bimîne.

Di 4 hezar salên dawî de

lawirek ji nehat kedikirin.

Masiya morina salê li dorî 4 milyon hêk dike.

Çûkên koç dikin wek tîpa "V" bi rêz dibin û bi vî awayî ji sedî 23 ji enerjîya xwe teserûf dikin.

Di salê 100 hezar semasî xwe tèn kuştin.

Yekem lawira nexweş nakeve, semasî ye.

Li Amerîka mijarek balkêş



PK - Piştî niqaşên dûr û dirêj liser rakirina 10 fermanên (emir) Mûsa Pêxember ji diwarên dadgehên mehkemeyên Amerîkayê niha ji niqaşa ji ser pera rakirina peyva "Xwedê" ket rojeva vî welatî.

Ateistê (Xwedê nenas) bi nav û deng Michael Newdow ket nav hewldanek dijwar ku ji ser dolarê Amerîkî îfadeya "In God We Trust" (Em ji Xwedê bawer dikin) rabe. Newdow vê îfadeyê li

dijî wekhevîyê dinirxîne û dibêje ku divê ev nivîs li dijî wekhevîya mirovan e.

Newdow got: "Min eleqedar nake ku kî ji çî bawer dike. Min tenê eleqedar dike ku hikûmet bi herkesî re liser bingehê wekhevî dide û distîne an na."

Berê ji li Amerîkayê bi biryara dadgehê 10 emirên Mûsa Pêxember ku li diwarê her dadgehê hatibû daliqandin hat rakirin.

Japonya dilê jinan xweş kir

PK - Di destpêka zivistanê de jibo jinan agahdariyek xweş ji Japonya hat. Firmeyek Japonî ya tekstîlê sutyenek ku bedena jinan germ dike derxist piyase.

Di rojên sartirîn de ji ev sutyen wê bi hêsani karibe jinan germ bike.

Li gora agahdariyan sutyenek weha bi minasebeta piştigiriya kampanyaya teserûfkirina ener-



jiyê hatiye hişê berpirsîn firmeyê.

Li xeribiyê bîstina xebera dilovaniya dayikan

Meta Xecê, diya Hesen Yilmaz

nûnerê PDK-Bakur li Yewnanistanê, roja 6ê vê mehê çû dilovaniya xwe.

Xebera reş, xebera mirina dayikan li xeribiyê gelek zehmet e. Mirov nikaribe naşê diya xwe bide ser milê xwe û bighîne goristanê, bi destê xwe wê di axa proz de ne veşêre bûyereke tal û tirş e. Pêneberên Kurd vê wekî kevirek di ber dilê xwe de dikin.

Bila rahmet li meta Xecê be, sebir û serxweşî ji bo

Hesen û malbata wî...

Li Çewligê xeteriya rûxandinê

Çewlig - Li soka Çewligê jiber çêkirina çarşiya bin erdê dukanên li der û dora inşatê ketiyê xeteriyê. Esnafên li der û dora inşatê ciyê ku jiber inşatê qelişine nişan didin û dibêjin ku jiber inşatê axa li bin dikanan tên xwarê û diwar diqelişin, wer xuyaye ku wê felaketek nebûyî çêbibe.

Xwediyên xaniyên li der û dora inşatê Burhan Bazencir, Eyup Bircan, Nurettin Bozaba, Ersin Bazencir Bahattin Korkutata, Hulki Keçeci, Ahmet Aydın, Bekir Baykuşak û Suphi Bor didin xuyakirin ku divê inşat bê sekandin. Xwediyê avaniyên li der û dor didin xuyakirin ku gava ku jibo inşatê erdê dikolin binê avaniyan jî pê re dikolin, emê êzink û komir bistînin ci tune, rê tune em li ber deriyê xwe valakin, em gava ku bixw azin herin kar an jî werin malê, em cambazî dikin. Rê tune û ci tune em derbas bin.



Nexweşê qansêrê li hêviya alikariyê ye

Ahmet Acar niha li benda alîkariya xêrxwazan e

Amed - Nexweşê qansêrê Mehmet Acar li qazaya Diyarbekirê li Erxaniyê jibo ku bikaribe bighê canxweşiyê li benda alîkariya xêrxwazan e. Mehmet Acar 47 salî ye û bavê 7 zarûkan e.

Mehmet Acar da xuyakirin ku 10 sal berê nexweşiya qansêrê lê peyda bû, jiber tunebûnê û xizaniyê nikaribû tedawî bibe û nexweşiya wî her çû liser wî giran bû. Acar da xuyakirin ku xwediyê karta kes e û gava ku li nexweşxana Fakulta Tip ya Universîta Diclê tedawî dibû, piştî hin tahlîlan haya wî ji nexweşiya wî çêbû.

Li gor ku Acar diyar dike ew mecbûr e li Nexweşxaneyê Fakulta Tip ya Çapa Istanbulê tedawiya berdewam bike, lê jiber ku ew xizan e ne ku perê tedawî herweha nikare perê rê ji peyda bike. Acar diyar dike ku jiber vê yekê îhtiyaciya wî bi alîkariya heye.

Ahmet Acar niha li benda alîkariya xêrxwazan e.


5 hezar cotyar koç kirin

Batman - Serokê Komela Cotkarên Batmanê Veysi Acar ragihand ku di van salên dawî de li Batmanê 5 hezar cotyar koç kirine.

Serokê Komela Cotkaran da xuyakirin ku li Batmanê 15 hezar cotkar hene; piştî çandina tutunê 5 hezar cotkar dest avêtin karê pembû û gemimê şamî lê tu feyde ji wan nedîtin û mecbûr man ji Batmanê koç bikin.


Serokê komelê Acar da xuyakirin ku li Batmanê masûlên alternatîf tunene û hikumetê jibo vê yekê gelek soz da cotyaran lê ji van sozan yek ji bi ci neani.

Acar da xuyakirin ku cotyaran ku pembû dajon ber bi îflasê ve diçin û îmkan û şansê wan tune ye ku bika-



ribin karê xwe bi rêk û pêk bimeşinin. Wekî din Acar got ku heke îmkan û mecalê cotyaran neyê serrastkirin, wê gelek cotyar ji van deveran koç bikin û herin.

Rahim Çelik (Dilşad)



Ev sê salin tu bi laşê xwe ne li nav me yî. Lê bi ciwanmêrî û kurdperweriya xwe tu di nav dilê me de wekî berê dijî...

Me bêriya te kiriye! Lê ew navê paqij û xebata ji bo kurdariyê ku te li pişt xwe hêştîye, ji bo me cihê sebir û sebat û serbilindiyê ye.

Heval û hogirên PDK-Bakur li Brîtanya

(1959 - 2002)

Malbat û mirovên te

Panorama

Dilbixwîn Dara



Mustafa Akkad

Di 70 saliya xwe de bû. Ji wan heftê salan tenê 20 sal li welatê xwe Suriyê derbas kiribûn. 50 salên wî li Emerîka buhurî bûn. Ji bo xwendinê wî berê xwe da bû Emerîka û li wir zewicibû, derbasî Hollywoodê bûbû û nişana yek ji mezintrîn derhênerên hemdem li rojhilata navîn qezenc kiribû.

Di hemû berhemên xwe yên sinemayî de, wî her demê hewl dida îmajeke baş ji bo Ereba û Misilmanan li cihanê peyda bike. Di her du filmên xwe yên mezin de «Name» û «Omer Mixtar» ku li seranserê dinyayê deng dan Akkad vê yekê nişan dide.

Di filma Omer Mixtar de ku tede qehremaniya lehengekî Libî Omer Mixtar li hember dagirkeriya Îtalî tê nişan dan, Antony Quinn rolê dilîze.

Di heştîyan de min li wê filmê temaşê kir. Hinek dimenan tesîreke mezin li ser min çêkirin. Bi taybetî jî sehneya ew zarokê ku piştî daleqandina Omer Mixtar diçe berçavka wî radike. Hin ji li ber çavên mine, dema ku dayîka wî bi destan digire û dixwaze wî ji meydana îdamkirinê bi dûrxîne. Qet ji bira min naçe, dema ku Omer Mixtar (Antony Quinn) dihere ber sêdarê û bêtirs weris dikişîne ber qirika xwe. Bi taybetî jî dema ku hawara jinan tê û hêstir dikeyin çavên serleşkerê Îtalî dema ku Mixtar di wê rewşê de dibîne.

Wan dimenan Şêx Seid, Qazî Mihemed û gelekên din dihanîn bira mirov. Ew jî bi heman şeweyî hatine îdamkirin.

Akkadê ku weke sefrekî li dinyayê digeriya û diçû kuderê rastiya Ereba û Îslamê rave dikir, bi destê Îslam û Ereban bi xwe hate kuştin, hem jî bi şeweyekî pir xerab. Dema ku min nûçeya kuştina wî bihîst bawer bikim wê şevê xew neketê çavên min, min ew nas nedikir, lê li kuderê çî li ser bihatiba nivîsandin bi qasî derfetan min dixwendin, bi taybetî jî hevpeyvîna ligel wî, gelekî balkêş bûn. Însanekî pir vekirî û rihet bû, rexnegir bû. Vê dawiyê dixwest filma Selahedin Eyûbî çêbike, lê belê tu welatên Ereban xwe nedane ber, kesekî destê alîkariyê dirêjî wî nekir. Ez di televîzyonekê li hevpeyvîneke wî temaşê dikim, dibêje: "eger ku min bixwesta jiyana serokekî Ereban bikim film, wê gelek dest dirêj bibana, lê min nexwest. Ji bo kişandina filma Selahedin, ez çûme kuderê destvala vegeyriyam..."

Mustafa Akkad sîrê serkeftina xwe wiha tîne ziman: "Bixwebawerî tenê ne bes e, xebat, kedayîn, zanebûn û cidîyeta di kar de ji şertên serkeftinê ne, şans jî rolekê dilîze..."

Mustafa Akkad di roja cejna Remezanê de ji Emerîka diçe cîbûna xwe Helebê, ji wir diçe Ammanê ji bo ku ligel keça xwe Rîma (li Beyrûtê dijîya) li daweta dostekî beşdar bibin, ewê ji Ammanê vegeriya Şamê, wê ji aliyê wezaretê rewsenbîrî ve bihata xelatkirin... lê belê terorîst bileztir bûn, berîku ew xwe bigihîne xelatê xwe gihandin wî, xwe di nava dawetê de diteqînin, ligel bi dehan kes keça Akkad Rîma tê kuştin, ew jî giran birindar dibe, li nexweşxaneyê dema ku nûçeya kuştina keça xwe dibihîse, dilê wî disekîne û wê dişopîne.

Mustafa Akkad di sala 1936 li Helebê ji dayik bûbû, 3 law û keçeke wî hebûn.



Hediye Dag

Ka jê xweştir!

Dibêjin zilamê gundi li ber tîfika êgir diponije. Adinî rojê icar derbasî wî aliyê tîfikê dibe, bi darîkekî xweliya êgir tevdi de û xwe bi xwe dibêje "erê, erê, dinya çiqasî mezîne, ez şevê din li wî aliyê tîfikê bûm û îro li vî aliyê tîfikê me!"

Icar a me jî ev mesele ye. Dinya çiqasî mezîne, doh em girtiyê Saddam bûn, îro Saddam girtiyê me ye! Doh em serokeşîr bûn îro em serokdewlet in! Doh em "xwenenas" bûn, îro em xwenas in! Belê, ew serokeşîr û xwenenasên ku dewleta Tirk ew biçûk diditin îro Serokatiya Kurda dikin û hebûn û statuya Kurdistanê Federal bi dewletên dinyayê didin qebûl kirin. Ew serokeşîr û kevneperestên ku hinekan bi navê sosyalîzmê ew şermezar dikirin, îro ji wan re li çepikan dixin, ji wan re dilîlin. Lê her çî dibin bila bibin, ew serokeşîr û kevneperestên ku me qîma xwe bi wan netanî îro xeyalên me bi rastiyê dixemilînin!

Bi qebûl kirina destûra Iraqê re êdî statuya Kurdistanê Federal, fermibûna zimanê Kurdî û sinorên Kurdistanê liser raya xwe rûnişt û bûn stûnên pêşeroja Kurdistanê serbixwe. Ev bi xebat û keftelefta van serokeşîr û kevneperestên çêbû! Bi vî rastiyê re êdî gellek ji serokên dewletên cûrbecûr rastiya bûyerên li Iraqê qebûl dikin û ev jî tê maneya guhertina pêşeroja nexşeya rojhilata navîn. Ev bi xebat û tekoşîna van serokeşîr û kevneperestên çêbû! Rastiya guhertinên li Iraqê hevqasî eşkereye ku êdî dewletên dagirkerên Kurdistanê jî mecbûr dimînin ku dev ji inkarkirina rastiyên berdin û li gotin û helwestên xwe poşman bibin. Ev bi xebat û helwesta van serokeşîran çêbû! Dewleta Tirk a ku bi dijarî li dij pêşketin û guhertinên li Iraqê û Kurdistanê disekin, îro nema kare rastiyên veşêre û mecbûr dimîne ku helwest û politîka xwe biguhere. Ev di sa bi xebata van serokeşîran çêbû! Berî bi çendakê Serokerkanê Artêşa Tirk Hilmî Ozkok ev rastî qebûl kir û ji rojnamevanan re got ku "divê em guhertinên li Iraqê qebûl bikin û politîka xwe li gor vî rastiyê bimeşînin". Ev bi fedakariya van serokeşîran çêbû! Piştî Wezirê Derve Abdullah Gul jî da dû şopa Hilmî Ozkok û rastiya guhertinên li Iraqê qebûl kir. Ev jî bi xebata van serokeşîran çêbû! Ji berê de bapîrên me gotine "rastî tehl e". Lê xuyaye gava meriv mecbûr dimîne "daqurtandina tehliyan" jî şêrin dibe. Ev tehlî di sa bi xebata van serokeşîran hat daqurtandin!

Erê, erê, dinya çiqasî mezîne! Ew serokeşîr û kevneperestên ku li gor me "nezan û xêşim" bûn, îro di qesrên serokên dewletan de, wek Serokên Kurda tînen hambêzkirin! Wek Serokê Kurdistanê û Serokdewletê Iraqê pêl xaliya sor dikin! Ew kevneperestên ku me qîma xwe bi wan netanî, îro destê Serok George Bush, Tony Blair, Angela Merkel û Silvîyo Berlusconi dihejin! Ew serokeşîrên ku sosyalîstên me wek xulamên emperyalîstan mohr dikirin, îro himên Kurdistanê serbixwe datînin!

Heger serokeşîrtî û kevneperestî xwedîderketina nîrx û hebûnên Kurdewariyê be, ka jê xweştir!

Heger kevneperestî parastina şan û şerefa Kurdewariyê be, ka jê xweştir!

Heger serokeşîrtî di riya Kurdistanê de şehîdbûn û fedakarî be, ka jê xweştir!

Û heger armanca serokeşîrtî û kevneperestiyê Kurdistanê serbixwe be, ka jê xweştir!

Lê!

Heger sosyalîzm û sosyalîstî piştigiriya Saddamê zalim be, ka jê nexweştir!

Heger sosyalîstî firotina tanq û topan, kuştina Kurda be, ka jê nexweştir!

Heger sosyalîstî bratiyek sexte, inkarkirina millet û welatê min be, ka jê nexweştir!

Û heger sosyalîzm û sosyalîstî nexwestina Kurdistanê serbixwe be, ka jê nexweştir!

Jiber wê,

Heger rojekê hinek ji min bipîrsin û bêjin: "Ma tu ji serokeşîr û kevneperestî?"

Ezê jî bêjim:

"Ma ka jê xweştir!"

Liser bûyerên Şemzînanê

Du aliyê bûyerên Şemzînan heye. Di alîkî da PKK, bi navê nuh Kongra Gel heye. PKK demê dirêje ku dest bi çalakîyên çekdarî, teqîn û mayinkirinê kiriye. Ev serê xwe bû sedemê alozî, nerehetî û provokasyonan. Gel êdî ji van çalakîyan bêzar bûye û westiya ye. Diyarbû ku wê hin kes ji van çalakîyan îstîfade bikin û ji bo alozî û bê îstîkrarî hin kûr bibe, tiştên weha gor berjewendiyên xwe bikar bînin.


Di vî nîktê de em dikarin bêjin ku di van bûyeran de aliyek din dewlet yan jî kesimek jî dewletê ye. Bûyerên dawî rola hêzên dewletê yê tari di bûyeran de derxist ortê. Bi zanayî û bi rêxistinî nebe jî Kongra Gel û hêzên dewletê di pratîkê da di nav tefaqê da ne.

Niyet û armanca van bûyeran, bi raya min, ev e:

Hin kes dixwazin bidin xuya kirin ku tehdîda terorê berdewam e, xetera perçekirina Tirkiyê hin di rojevê da ye.

Ji bo vî yekê jî divê rola ordiyê kêm nebe, divê şertên awarte berdewam bin, û divê qeyd û tedbîrên li peşîya hêzên demokrat û welatparêzan sist nebin.

Wek bala herkesî dikşîne, ev bûyer zêdetir di vî dema dawî, ku muzakerên di nabeyna YE û Tirkiyê bi armanca endamiyê dest pê kir, de



Bayram Bozyel

dîqewimin. Ev jî dide nîşandan ku hêviya ku ji van bûyeran tê kirin, xitmandina pêvajoya YE ye. Çînkî yê li paş van bûyeran baş zanin, ger bêistîkrarî û alozî bidome wê pêvajoya reforman û demokratîkirina Tirkiyê sist bibe û ihtimal e ku pêşde demê ev pêvojo bê birandin yanî qut bibe.

Tabî, dewlet di van bûyeran da di nav yek helwest da nîne. Di nav dewletê da nakokiyên berjewendî hene.

Wek tê zanîn, serî de di nav ordiyê de hin hêz û hin hêzên di nav burokrasî, çapemenî û di warên siyasî de, paşverûtiyê, statuqoyê û dijîmîniya YE temsil dikin û bo armancên xwe jî her firsendê îstîfade dikin.

Hukûmet, bi taybetî Partiya AKP li paş prosesa YE disekine ji ber ku berjewendiyê wî tê da ye û qedera wî

bi reformkirina Tirkiyê va girêdayî ye.

Ji ber van sedeman leşker heta ciyek di nav van bûyerên provokatif da ne û tabî ye ku xwedî li van çalakvanan derdikevin. Dij viya AKP-hukûmetê diçe ser van bûyeran. Çînkî zane ku ev çalakî di bingeha xwe da li dij hukûmetê û siyaseta wê ya sîvîlkirinê pêk tînin.

Helwesta li hember van bûyeran wê bibe nişana hêz û iqtîdarbûna hukûmetê.

Ji alî din bûyerên Şemzînan yê dawî firsendek pêşkêşî civatê û hukûmetê dike; ji bo ku hêzên tari, hêzên organîze yê bê qanûn bînen teşîrkirin û tesîra wan bê şikandin.

Ji bo ku ji van bûyeran neticên pozîtîf bê stendin wezîfe him jî hêzên pêşverû ra dikeve û him jî dikeve ser milê hukûmet û parlamentoyê.

Divê hêzên demokrat li hember van bûyeran bédeng nemînin û minasebeta van bûyeran gel organîze bikin û bikin hereketê.

Wezîfê mezin, bê şik, dikeve ser milê hukûmetê. Bibe nebe destê hukûmetê dirêj e. Dikare him di warê yasayî û him jî di warê îdarî de tedbîrên nuh bîstîne, mekanîzmê edeletê bişuxulîne.

Bi vî awayî, dibe ku, bûyerên Şemzînan bibe qonaxek ji bo zelalî, şefaqî û reformkirina Tirkiyê ye.

Dewleta terorîst


Ger dinya bibîne bûyera Şemzînan minakek gelek eşkere ye û ev minak, karakterê dewleta tirk jî baş dide diyar kirin. Yê ko dewleta tirk jî nêzik ve nas dikin, baş dizanin, himê wê yê esasiyê ko hukumraniya wê li Kurdistanê li ser lingan dihêle şidet e. Helbet formê vî şidetê yek jî yasayî ye û ev aliyê yasayî ne li ser guhê kesî ye jî. Lê mixabin ev şideta yasayî tîra vî dewletê nake û lewra wan yasayên xwe yê faşîzan jî bînpê dike û bi metodên terorê li Kurdistanê kar dike. Bûyera Şemzînan jî vî karakterê dewleta tirk baş nîşan dide; ev bûyer jî hezaran yek e û wê terora dewletê ya sistematîk jî baş tîne ber çavan.

Lewra serokwezîrê tirk Erdogan jî dibêje; „ev ne bûyereka lokal e“

Serqumandarê Hêzên Serzemîni Yaşar Buyukanit jî bo terorîstê bûyera Şemzînan dibêje „ew eskereki baş e“. Ji ber ko ew „eskere baş“ yanî terorîst bi salan li gel Buyukanit bi heman karên terorîstî xebitiye. Yanî ev teror jî serî heya bîni li gorî hiyerarşiyeka merkezî têt kirin.

Baş e; gelo çî ferq di navbeyna bombabarankirina pirtûkxaneyê Şemzînan û bircên New York û trena Berçelonayê û otelên Urdu-nê heye?

Di jîngeha însaniyeyê de cihên



Merhmet Sanrı

herî sîvil û masûm, bêşik cihên wekî îbadetxane, nexweşxane, dibistan pirtûkxaneyê nîn.

Ne Usame bin Ladin, ne Elkaide ne jî Ensar el İslam pirtûkxaneyê Şemzînan bomba kir. Timên teybet yê tirk ko ev e bi dehan sal in li ser kar in, bi nasnameyên xwe yê fermî û bi cebîlxaneyên artêşa tirk ew pirtûkxane bombe kirin. Generalên tirk di bin lîvên xwe ve dikenin û dibêjin „em peyayên xwe nas dikin karên wiha ecemî nakin“. Qelemşorên tirk jî li ber dikevin ko ev kar gelek bi ehmeqî hatiye kirin. Gelek eşkere ye ko, bûyera Şemzînan û yê wekî wê, aliyê praktîzekirina siyaseta tirk yan li Kurdistanê ye; manifestoya vî siyaseta ya terorîk jî „Kitêba sor“ a veşartî ye.

Dinya hemî dizane li Tirkiyê destûra esasî ew kitêba sor e. Li wê kitêbê de çî heye tenê yê esil „xwediyê dewletê“ dizanin. Ji be-

riya niho çend rojekê hindêk gotin di derbareyê vî kitêba sor de hatin gotin; hiku meta Erdoganî jî ne got kitêbek wiha nîne. Wezirê derve yê Tirkiyê Abdullah Gul got; kê ev agahdariyên veşartî yê di heqê vî pirtûkê de dayî bin, em dê wî/ê tesbît bikin. Hemî desthilatdarên payabilind yê Tirkiyê ketin ber wê tasuwase ko ka çawa ev agahdariyên veşartî derketine...

Lewra bûyera Şemzînan, ne bûyera yekê û neya hezarûyekê ye jî. Ev bûyer, minakeka biçûk e ji terora sistematîk ya ko ev 80 sal e dewleta tirk li Kurdistanê dimeşîne.

Baş e; dema ko Erdogan dibêje „ev kar ne lokal e“, Erdogan dê wekî hikûmet çî saffîbîniyê bixê vî karî? Bersîva vî gelek eşkere ye ko, Erdogan bi xwe li gorî prensîbên „pirtûka sor“ dikare Serokwezîrtiyê bike û ne tiştek di. Prensîbên „pirtûka sor“ jî destûra dewleta îllegal û terorîst e.

Lewra êdî divê kurd bi cidî û bi diqet, bi rê û metodên modern û bi arikariya mieseseyên ko di van karan de pîspor in, li ser hêmi karên terorane yê vî dewletê rawestînin, lîbîkolîn belge û delîlên dewleta terorîst berhev bikin û raberî hemî platformên meşrû yê dinyaya medenî bikin, da ko ew dewleta terorîst di wijdana dinyaya medenî û însaniyeyê de bê mehkûm kirin.

Dewleta Tirk dev ji har û hovîtiya xwe bernade

Di 9ê mehê de li Şemzînanê hewldana kuştina Kurdekî di nav gelê Kurd û polisên Tirk de bû sebaba şer û pevçûnên mezin. Li gelek bajar û navçeyên Kurdistanê polisên li dorê deh Kurd kuştin û bi dehan kes birîndar kirin.

Hewldana kuştina Kurdekî Bakurê Kurdistanê rakir ser piyan.

Li gelek bajar û navçeyên Kurdistanê ev hefteyeke ku di navbera Dewleta Tirk û Kurdan de pevçûnên girseyî dom dikin.

Her tişt di 9ê mehê de destpêkir. Li Şemzînanê astubayekî Tirk bi navê Ali Kaya bombeyek avêt dikana pirtûkfiroşekî welatparêz Sefer Yılmaz.

Sefer Yılmaz bûyer wiha ragihand raya giştî: "Min li erdê bombeyek digindire dit. Ez pêhesiyam ku mirovekî montekî rengêqehweyî lê direve. Min da dû wî û qiriyam, "Ew kesê ku bombe avêt direve, wî bigirin!". Piştî 100 metreyekî vî kesî berî ku xwe bigihîne texsiya ku hevalê wî li bendê bûn û birevin, hat girtin. Şemzîniyan xwestin wî li nîç bikin."

Xelkê dora texsiyê pêçandin û nehiştin yên mayî ji birevin. Di bagaja erebê de 3 keleşkof, 2 bombeyên dest, 4 dosyeyên ku ji 300 rûpelan pêkhatî hat bidestxistin. Di van dosyeyan de kroki û nexşeyên ku dikana pirtûkfiroş liser hatiye îşaretkirin û nav û sûretên gelek kesên ku ji xwe re kiribûn hedefa kuştinê, muxbîr û milîsên dewletê hebû.

Ji sê kesên ku xelkê teslîmî polis kirin piştî lêpirsîna dozger 2 kes serbest hatin berdan û kesek hat girtin.

Bi teqîna bombeyê Mehmet Zahit Korkmaz jiyana xwe ji dest da.

Her sê mensûbên JITEMê di îfadeya xwe de ji dozger re gotine ku, "Em bi tesadufî li wir bûn" û dozger jî "ji wan bawer kiriyê" û ew serbest berdane.

Ji aliyê din ve eşkere bû ku serokê Daireya tekoşîna li dijî terore Selim Akyildiz jî berî destpêkirina bûyeran çûye herêmê. Berdevkê Midûriyeta Giştî ya Emniyetê İsmail Çalışkan liser pirs rojnamevanan hebûna Akyildiz ya li wir jî bi "tesadufî" nîrxand.

Piştî ku Şemzîniyan serbestberdana mensûbên JITEMê bihistin dest bi berxwedan û protestokirinê kirin.

Di dema ku dozger liser texsiyê kifş dikir û parlamentê CHPê yê Hekarî Esat Canan jî li wir bû xelk dîsa ji texsiyê hatin gulebaran kirin û Ali Yılmaz hat kuştin, bi dehan kes birîndar bûn.

Di 12ê mehê de kesekî bi navê Veysel Ateş girseya gel gu-



Dawiya otomobila ku ji hêla xelk ve hat girtin

lebaran kir û ew jî hat girtin ku îtirafçiyekî PKKê ye. Ali Kaya hat berdan û subayekî din bi navê Tanju Çavuş hat girtin.

Daxuyaniyên Hikûmeta Tirk Berpîrsên Hikûmeta Tirk bi daxuyaniyên xwe aciziyên xwe anîn ser zimên.

Serokwezîrê Tirkîyê M. Tayyip Erdogan bi daxuyaniyek çapamenî ragihand ku berpîrsên vî bûyerê kî dibe bila bibê wê berdêla xwe bide.

Wezîrê Karê Derve Abdullah Gül got ku Tirkîye êdî ne Tirkîya berê ye û wê ev mijar tari nemîne û bê rohnîkirin.

Fermandarên Artêşa Tirk xwedêgiravî jibo bandorê liser pêvajoya darizandinê nekin eşkerekirin ku çêtire niha tu şîroveyan nekin.

Bi ser ku eşkere bû ku texsî liser Fermandariya Jendirmeya Hekarî ye jî, Waliyê Hekarî Er-

dogan Gürbüz di programek CNN de got, "Ne mimkune ku eleqeyek hêzên ewlekariyê bi vî karî re hebe."

Piştî teqînê û girtina endamên JITEMê gelê Şemzînan rabû ser piyan. Di nav xelkê û hêzên ewlekariya Tirk de pevçûnên dijwar çêbûn û di encamê de du kes hatin kuştin û bi dehan kes birîndar bûn. Bazirgan derabên dikanên xwe danîn. Ketin û derketina bajêr hat qedexekirin. Dibistanên bajêr hatin girtin.

Polîsekî Tirk di navbera şer de telefonê ji Mehmet Agar re vekir û alîkarî jê xwest. Ev telefon li Tirkîyê carek din mijara "Dewleta Kûr" anî rojevê.

Rojnameyên 16ê mehê yê Tirk nûçeyek belav kirin ku ev polisê ji Agar re telefon vekiriyê jî wezîfeya xwe hatiye stendin.

Li gorî nûçeya rojnameya Diyarbakir Sözü Ali Kaya kesekî

bi îtirafçiyên re xwedî pêwendî ye û beşdarî lêpirsîna ji sedî bêtir karmend bûye. Ali Kaya li Fermandariya Jendirmeya Diyarbekirê dixebite.

Navê Kaya di îtirafên elemanê JITEMê Abdulkadir Aygan de jî derbas dibe.

Fermandarê Hêzên reşayî Orgeneral Yaşar Büyükanit bi daxuyaniyekê eşkere kir ku Kaya Kurdî zane û li Başûrê Kurdistanê bi wî re karê hêja kiriyê û ew leşkerekî bikêrhatî ye.

Li bajarên din piştigiriya bi Şemzînan re

Li Hekarîyê jibo piştigiriya Şemzîniyan û şermezarkirina dewleta Tirk gelê Hekarî xwepêşandinek lidarxist û deriyê dikanên xwe girtin. Polisên Tirk bi bombeyên gazê midaxaleyî gel kir û di navbera wan de pevçûnek derket. Gelê Hekarî bi kevîran bersîva êrişkariya polisên da, Di encama şer de ji de-

han bêtir kes birîndar bûn. Polîsek jî bi teqîna bombeya gazê ya di destê xwe de birîndar bû.

Di 12ê mehê de vî carê jî li Wan û navçeya Agirî Bazîdê Kurd daketin kuçe û kolanan.

Li Wanê polisên re nedan ku gel xwepêşandin û meşekê lidarbixe. Polisên bi bombeyên gazê midaxale kir û xelkê jî bi kevîran bersîva polisên da û otomobilek wan şewitand. Di encamê de 3 kes hatin binçavkirin.

Li Bazîdê xwepêşandinek bi pevçûn bi dawî hat û hin dikanan derabên xwe danîn.

Di 13ê mehê de ji aliyê Platforma Demokratîk ya Diyarbekirê ku ji 28 partî û dezgehên sîvil û demokratîk pêk tê li Amedê xwepêşandinek bi navê, "Çareserkirina pirsê Kurdî bi awayekî aştiyane û demokratîk" hat lidarxistin. Bi deh hezaran Kurdên ji bajar û navçeyên ji derûdor herikin Amedê, him piştigiriya Şemzînan kirin û him dazwaza çareserkirina pirsê Kurdî kirin.

Ji Şemzînan bixwe jî li dorê sê hezar kes beşdarî xwepêşandina Amedê bûn.

Wek li gelek deverên mayî li Amedê jî di navbera polisên Tirk û Kurdan de şer derket û li kolanan berdeham kir.

Ji aliyê din ve di 15ê mehê de polisên êrişê birin ser xwepêşandana li Gevêrê û di encama şer de 4 Kurdan jiyana xwe ji dest dan û 10 kes birîndar bûn.

Di 15ê mehê de jî li Gevêrê polisên Kurdek kuşt û gelek kes birîndar kirine.

Her wiha di 16ê mehê de li bajarê Hekarî di navbera Polis û Kurdan de şer û pevçûnek derket û vî şerî 5 seetan dom kir. Di encamê de kesekî jiyana xwe ji dest da û 7 kes birîndar bûn.

Şer û pevçûnên di navbera gelê Kurd û hêzên ewlekariya Tirk de ne diyare ku wê heta kengî bidome û li ku raweste.

Di vî dema ku ji zûdeye Dewleta Tirk serî li çalakiyên wiha nedida bûyera Şemzînan çî li hundur û çî li derve bala raya giştî kişand ser xwe. Dewleta kûr a Tirk dixwest bi vî provokasyona xwe ji aliyekî de tekiyên navbera Kurdên bakur û yê başûr xirabike û ji aliyê din de jî bi vî sedemê karibe êrişî bakurê Kurdistanê bike. Destketinên bakurê Kurdistanê wek kelemeki di çavên dewleta Tirk de radibe û jiber vî heta ji wan tê dixwazin bî riya provokasyon û terore hincetên êrişkirinê ji xwe re derxin. Lê hişyarî û welatperweriya gelê Şemzînanê ev lîztika dewletê serûbinê hev kir û dewleta ku derketibû neçîra Kurda, bixwe ket xefikê!





biravetî

Bayram Ayaz

Mêrxasiya xelkê Semzînan dikare bibe nimûneya berxwedana asitiyane û sivil

Mêrxasiya xelkê Şemzînan a li diji provakatoran di rojeva Kurdan de mijara sereke ye. Divê tevgera bakurê Kurdistanê liser şopê be, heta ev bûyer bê zelalkirin.

Di van şeş heft rojan de rastiyeke aşkere bû ku ev bûyer provakasyonê servîsên dewleta kûr e, ihtimaleke mezin karekî îstixbarata qumandaniya jendirman û ya qumandaniya leşkerên beriyê ne. Ji xwe orgeneral Fevzî Türkerî û Yaşar Büyükanit di nav ordiya Tirk de wek nûnerên baskê Tirkçî tîn zanîn, di qumandariya hêzên taybetî Kolordiya li Kurdistanê de kar kirine. Berdewamiya JITEMa berê JİTa (Teşkilata İstixbarata Jendirman) nuha di bin emrê orgeneral Fevzî Türkerî de ye. Herdu orgeneralan ji bi helwest û beyanatên xwe li mirovên xwe xwedî derketin.

Belgenamêyên ketine destê xelkê Şemzînan ku hinek ji wan gihan rojnameyan û hatin weşandin, ji van kaxizan aşkere dibe ku ev êrîşana karên JİTê ne. Ew kesên van karan dikin, wisa bi hêşayî nayên derdestkirin û cezakirin. Artêşa Tirk nahêle, ew dê mirovê xwe biparêzin.

Çi bi sûcdarên Susurlukê hat, li ber çavan e. Serkêşê çeteyan yê wê demê Mehmet Ağar bi aşkere digot: „karê dewletê bû me kir, ez ne poşmanim û nabêjim çî bû çî qewimî, ev sîrrên dewletê ne!“ M. Ağar nuha di Meclîsê de parlemene û serokê partiyek e, ku di dema wî ya çeteyîya dewletê de, ew partî liser hikum bû, seroka partiyê Tansu Çiler jî serokwezîr bû.

Dewleta kûr dê hewlbidê ku plankêrê vê bûyerê veşêre. Jiber ku eger aşkere bibe, dê gunehbarî û rola JİTê û servîsên din diyar bibe. Li gor agahdariyan, Sawciyê Wanê ev bûyer wek sûcdariyek krîmînal herêmî nîrxandiyê û nexwestiyê dozê bike. Kêşe sipartiyê sawciyê qaza Şemzînanê, daku mesele di wê derê de bihêlin û bidin jibirkirin.

Dewleta kûr dixwaze ser vê provakasyonê bigre, jiber ku wan xwe dan dest, rezil bûn. Vê carê nikaribûn jiber xelkê birevin, hatin girtin. Xelkê Şemzînan biçûk mezin hemî kes dizanin provakator û gunehbar kî ne! Ev girîng e!

Berxwedana xelkê Şemzînan ya aştiyane dikare jibo têkoşîn û xebata sivil û demokrat bibe nimeneyek baş. Tevgera bakurê Kurdistanê divê ji vê tecrûbeyê sûdê werbigre.

Di şertên îro de berxwedaneke çekdarî li diji dewleta Tirkîyê ne ji berjewendiya Kurdan e. Li ser axa Kurdistanê şerê çekdarî careke din xerakirin û malwêraniya Kurdistanê ye. Îro şerê çekdarî zêdetir bi kêrî ordiya Tirk tê, bi kêrî statûkociyên Tirkçî, Kemalîst û neofaşîstan tê. Ev hêz dixwazin şerê çekdarî bikin hucet ku di nav Tirkan de dijminahiya Kurd û Kurdistanê berfirehtir bibe û zêdetir leşker û polis li Kurdistanê bicih bibin. Bi taybetî deverên nêzîkê sinorê Kurdistanê azad dixwazin bi temamî militarîze bikin. Heta planên wan yê êrîşa ser Kurdistanê azad ji heye, li firsendan digerin.


Berxwedaneke aştiyane, sivil û demokrat dê planên dewleta kûr ser û bin bike. Li Ukrayna û Gurcistanê bi hêz û berxwedana aştiyane rejîmên otorîter serî tewandin, têkçûn. Li Libnanê xelkê liberxwe da, Yekîtiya Miletan ji xwedî li doza wan derket û hêdî hêdî Libnan ji nav lepên rejîma baasiyên Sûrî rizgar dibe.

Tevgera bakurê Kurdistanê dikare ji van tecrûbeyan li gor şertên welatê me îstifade bike.

Lê di heman demê de divê mirov lê şiyar be ku gel nekeve dafika provakatoran jî. Dibe ku li hin deveran dewleta kûr xelkê bi destê provakatoran daxê meydanan û kuştinê bike ku xelkê terorîze û çavtirsayî bikin. Gel û tevger divê li vê yekê jî şiyar bin.

Nuha rojeva bakurê Kurdistanê divê Şemzînan, Gever, Şernex û Colemêrg be. Deverên „sêgoşe“yê cihê stratejîk e! Dewleta kûr li wan deran çalak e, li dû provakasyonan in.

Rejîma Sûriyê bihevket



ŞAM - Her ku diçe cîh li rejîma Sûriyê teng dibe. Kuştina Serokwezîrê Lubnanê Refîq Herîrî, piştgiriya terorîstên li Iraqê, zilma liser Kurda û gellek bûyerên din dibin sedem ku rejîma Sûriyê di nav awira gelemperîya cihanê û dewletên demokrasîxwaz de bê rûşê û recrîtîrînin. Zixtên dewletên hevpeyman û biryarên Komîsyona Navnetewî ya Lêkolînê hişt ku rayedarên Dewleta Sûriyê rîya ber lingên xwe nebin û xuyaye ev ji bûye sedem ku rayedarên dewletê bihevkevin û şerê hev bikin.

Rojnameya Elsiyaset a Kuweytî di weşana xwe ya 8/11/2005an de ji devê çend şahidan radigihîne ku berî bi çend

rojan di navbera çekdarên Serokê İstixbarata Sûrî Asif Şewket û Hêzên Komarî de şerek çêbûye. Asif Şewket bixwe hem zavayê Beşar Esed e û hem jî Serokê İstixbarata Sûrî ye. Asif Şewket yek ji wan şeş kesane ewên ku di kuştina Herîrî de tîn destnîşankirin û herweha Dadwerê Alman Detlev Mehlis girtin û radestkirina wî ji Sûriyê dixwaze.

Rojname Elsiyaset bi berdewamî balê dikşîne ser serdana Hisnî Mubarek û pêşniyazên wî. Dixuye ku Hisnî Mubarek zixtê dide Beşar Esed ku ew wan şeş xalên Komîsyona Navnetewî pêkbîne da ku ew kari-be di navbera Beşar û Amerîkiyan de here û bê. Hisnî Mubarek ba-

wer dike ku heger ew şeş xal bicihneyên wê navbera Beşar Esed û Amerîkiyan xweş nebe.

Ew şeş xalên balkêş ev in:

1. Teslîmkirina hemî kesên ku Serokê Komîsyona Navnetewî ya Lêkolînê Detlev Mehlis destnîşan kirine. Di serî de birayê Beşar Mahir Esed û zavayê wî Asif Şewket.

2. Devjêberdana şandina xwekuj û terorîstan jibo Iraqê.

3. Desttewerdanan di Lubnanê de neke û ligel çareserkirina pîrsa sinoran, peywendiyên deplomasî pê re çêke.

4. Devjêberdana hewandina rêxistinên Fîlistînî yê şerxwaz û çeknedana endamên wan yê li Lubnanê. Herweha

buroyên Hamas, Cihad û rêxistina Ehmed Cibrîlî li Şamê bigire.

5. Bila hîlbijartinên parlamenî liser pîrensîpa pluralîzmê bîn kirin.

6. Berdana hemî girtiyên siyasî ku hejmara wan 128 000 in. Bi resmî ragihandina navên girtiyên Lubnanî û Sûrî yê ku di bin êşkenceyê de mirine.

Rojname radigihîne ku Hisnî Mubarek şîreta guhertina Wezîrê Derve û Wezîrê Ragihandinê li Beşar Esed kiriye. Li gora Rojname Elsiyaset Lubnaniyên ku li Sûriyê hatine wendakirin digihê 364 kesan û ew hemî di zindanên Sûrî de bi destê Serokên İstixbaratên Sûrî Elî Dûba, Hesên Xelîl û Asif Şewket hatine kuştin.

Sekreterên 4 sefaretên Ewropî li Qamişlo ne

Di demek wiha de ku hikûmeta Sûriyê di nava alozî û astengiyan de diji û ji aliye navnetewî ve tê îzolekirin, pîrsa Kurdî wek pîrsa neteweyekî derdikeve pêş û bala Ewropîyan dikîşîne ser xwe.

Vê hefteyê sekreterên 4 sefaretên Ewropî çûne serdana Qamişlo û bi siyasetvan û rewşenbîrên Kurd re rûniştin.

Sekreterên Sefaretên Almanya, Finlanda, Belçîka û Kanada li mala berpirsiyarê Teyar El Mustaqbel Meşel Temo hatine cem hev û ligel berpirsiyarên Partiya Yekîtiya Kurd li Sûriyê û çend rewşenbîr û şexsiyetên serbixwe re yê weke İbrahim Yosuf re hevdiştin pêk anîn.

Hate ragihandin ku di vê hevdiştinê de liser rewşa Kurdên Sûriyê û çareserkirina pîrsa hemwelatîbûnê û gelek pîrsên din hatiye rawestandî.



Dîplomasi berdewame

Serokên Kurda di diplomasiya nevetewî de gavên girîng tavêjin pêş û jibo avakirina Kurdistana pêşerojê himên resen (esasî) datînin. Ev diplomasiya xurt bi serdana Qesra Spî destpêkir û bi berfirehî berdewam dike. Piştî serdana Londra, Berlîn, Wiyana niha jî dor giha Romaya Îtalyayê û herdu Serokên Kurd, Mesûd Mustafa Barzanî û Celal Talabani, bi Serokwezîr, Serokkomar û Papa Benedict re hevdiştin li darxistin. Serokê Herêma



Kurdistana Federal Mesûd Mustafa Barzanî di 14/11 de serdana Romayê kir û ew jî alî rayedarên dewleta Îtalyayê ve hat pêşewazîkirin. M.M.Barzanî di serdana Papa de xalçeyek bi dîmenê Îsa Pêxem-


ber neqîşandî diyarî Papa kir. M.M.Barzanî jî Awûstûryayê derbasî Îtalyayê bû û di serdana Vatîkanê de ew jî alî Papa Benedict 16.ve hat qebûlîkirin.

Serdana Qesra Spî naskirina Kurd û Kurdistanê ye

Şerafettîn Elçî

Serdana cenabê Serok Barzanî ya jibo Qesra Spî û Londrayê tê wê maneyê ku milletê Kurd û welatê wî Kurdistan di warê hiqûqa navnetewî de tê naskirin. Serok Barzanî ne wek şexsekî yan ne wek Serokê Herêma Kurdistanê ev serdan kir. Ewî bi cil û bergên xwe, bi zîmanê xwe, di Qesra Spî de milletê Kurd bi xwe re temsil kir. Cil û berg û zîmanê Kurdî li Qesra Spî bû sembola Kurd û Kurdistanîyê. Di hevdîtina cenabê Serok Barzanî û Serok Bush de tiştek balkêş hebû ku hevdîtin ne tenê di warê hevdîtinekê resmî û protokolekê de bû. Di vê hevdîtînê de germiyek jî dil hebû. Wek ku du dostên ezîz bi coş hev hembêz bikin. Ev hevdîtin jî pêşewaziya protokolekê wêdetir û pêşdetir bû. Di wê de Amerîka û Kurda destê dostaniyê didan hevdu. Ev pêşewazî jibo hemî cihanê mesajek bû. Amerîka û Kurd dostên hev in û wê ev dostanî bidome. Jibo vê yekê neyar û dijminên Kurda jî qehra dibeicin lê tu çara wan tunebû. Ev neyar dizanin ku êdî ewê wek demên berê nikaribin zilm û zora xwe liser Kurda bidomînin. Ewê êdî nikaribin heyîna Kurda û welatê wan înkâr bikin. Heyîna Kurda û welatê wan êdî hat tescîlîkirin. Gava milletek û welatê wî hebe, béguman wê mafê wî ye netewî jî hebe.

Wê Amerîka û hevpeymanên wî guhertinên mezin di Rojhilata Navîn de çêkin. Wê projeyek mezin jibo tanzîma herêmê bête



meşandin. Wê di vê projeyê de rola Kurda mezin be. Kurdên ku ji sedsala nozdan de wendabûbûn adeta ji nuh de tîrî keşîfîkirin û wê di Rojhilata Navîn de Kurd bibin aktorek mezin. Sedsala bîsta sedsala felaketa Kurda bû. Kurd di agirê xwe de dişewitîn û di nav xwîna xwe de digewizîn. Tu kes ne bi hawara wan ve dihat û ne jî li halê wan dipirsî. Dagirkeran wek însafa xwe zilma xwe dajotin. Sedsala bîstûyekê wê bibe sedsala bextewarî û pêşdeçûna Kurda û wê roja Kurda geştir bibe. Lê divê Kurd xwe li gor dema nûjen biguherin û bi aqil tevgerê bikin.

Dewletên cîran bi hedekekî zêde jî ve serdanê nerazî bûn. Di vê serdanê de qedr û qîmetê ku ji Serok Barzanî re hate kirin ji serokên wan dewletan re ne hate kirin. Ev îşareta dostaniyê jî dil e. Îcar jibona vê tîrsa dewletên cîran heye. Yanî, yê Kurdistanê û Kurda nasdikin dizanin welatê wan yekparçe ye. Dema di herêmê de mafên siyasî û netewî hat qebûlîkirin, wê tesira xwe bide parçeyên din jî. Îcar jibona vê dewletên dagirker ketine nav tîrsek mezin û dibêjin "gelo wê kengî dor bighê me?"

Lê rîya aqilane eve ku ew dewlet wê tîrsê jî dilê xwe derêxin, wek dinya medenî, wek dinya modern bi Kurda re lihevben, bi dostanî, bi bratî û bihevde dewletek demokratîk çêkin ku Kurd tede xwedî gotin bin. Divê di herêmê de guhertin çêbin û ev dewletên di herêmê de jî bîngê de mejiyê xwe biguherin û êdî wek berê liser înkarkirina Kurda siyaseta xwe nemeşînin.

Ji vê û şûnde wê literatur û zîmanê medya û dewleta Tirk bê guhertin. Tê dîtî ku ewên di dema berê de gotinên wek "serokeşîr" bikartanîn, îro zîmanê xwe diguherin û gotinên "birêz" bikartanîn. Bivê nevwê, gava dilê mirov nexwaze jî şert û şîrût zorê dide mirov. Dewleta Tirk vê dibîne. Guhertina ku di herêmê de dibê Tirkîyê mecbûrî guhertinan dike. Di vê de lazîme herkes bizane ewên ku wek serokeşîr tîrî binavîkin, bi kêmasî dusedsalî jibo milletê xwe û welatê xwe xebatî kirine û xwedî qabiliyet in. Yê dilnexwaz dibêjin serokeşîr. Ew serokeşîr di warê siyasetê de jî serokên wan gelek tîgîhiştîtirin û siyaseta xwe li gora realpolitikayê dimeşînin. Jibona vê bila tukes serokeşîrtîyê jî me neke kêmasî. Ev qabiliyeta wan zêdetir dike, qabiliyeta ku karibin komarekê, civatekê, herêmekê îdare bikin. Tîrka ew gotin jibona heqaretê bikaranî. Lê êdî wê nikaribin jibo heqaretê jî van gotinan bêjin. Êdî wê bi rêz û edebî gotinên xwe haydar bin. Yek Serokkomar e û yek jî Serokê Herêma Kurdistanê ye!

Nexweşiya Meji



Kadîm Kan

Wexta yekî siyasetmedar bi nexweşiya înfamatsiyona meji an jî bi "porfyri" dikeve, bi xwere tiştê jibona wî hatiye gotin an jibona xelkê bixapîne ezber kirîye, hemî tiştî jibirdike.

Min bixwe pê nizanibû

Di nexweşxaneyek dînan de doştêkî min wek psîkiyatrist kar dike. Rojêkê jî min re got ku çend nexweşên Kurd jî li cem wan hene û ew jî hevdu baş fahm nakin.

Ji ber ku wî mîraqe min a liser siyasetmedarên sextekar zanibû.

Jibona min bi taybetî got:

-Dibêjin hinek jî wan berî nexweşiya xwe siyasetmedar bûne.

-Ma tê karibî carna bêyî û jibona zîman alîkariya me bikî? Mîmkune ku hinek sebra wan jî bi te bê.

Ez fikirî madem Kurdî ez mecbûrîm.

Rojêkê ez çûm. Hevalê min di derbarê wan de hinek agahdarî da min.

-Yekî jê, her gav nav lingê xwe duxrîne. Kufirbaze û tehdîtkare. Jiber nexweşiyê dengê wî zirav bûye Her çend seetan de gotarekê dide û di paşîya gotara xwe de jî herdem yek tiştî dibêje. "Alçaklar (nemerdn) ez we xwedî dikim"

E duduyan dixwaze herdem cilê taxîm lixweke. Wexta bi kesî re dipeyive pêşîya cakête xwe digre û rola şermokekî xemgîn û ramandar dilize

-Ê sistiya merivekî çawaye?

-Merivekî tariye. Du paqijker jî bi hevdura pipeyivîn. Wan guhdarî dike.

Pêşî em çûn cem yekî gîrs û qelev. Mû jî poz û guhê wî dirêjî derve bûbû û qirejokî bû. Birûyên wî wisa dirêjbûn ku meriv karibû zengilan pêveke.

Xwe qet tevnedida. Lê pêçiyê xwe wek tu tespîh bibî û bîni, dibir û dianî.

Ez hêdî bi aliyê wî ve çûm û li nêzê wî sekinîm.

Li min mîzekir û bi dengêkî bilînd lê zirav wek ê zarokekî 7-8 salî, ji min pirsî: -Tu çiyî, tu çi kesî? Tu karî jibona min çi bikî? Ma te navê Apolon bihiştîye?

Ez hinek fikirîm. Min qerar da ku ez tenê bibêjim ez Kurd im.

Wî go:

-Ez Kemalîstêkî internasionalistim û hinek Kurdî jî di xwîna min de heye. Bi qurana te xwendîye diyamin Tîrke û bavê min jî niv Kurd û niv Erebe. Lê xalanên min, axx li wan bêbexta, xalanên min Tîrk in. Gerek meriv guhê xwe nede wan teresa!

Bê ku nefesê jî bistîne berdewam kir. "Wexta me pir hindike. Tiştên ez dibêjim wek emîr qebûl nekin. Navê partiya me bila vê hefte "partiya gundiya û bajarîyan" be. Hefta bê jî eger me hevdu nedît navê wê bila "partiya mirîdên şex" be. Hinek sekinî.

Û jî nişka ve go: "Gerek hûn mektûbên bin bikin ansîklopedî û liser navê ansîklopediyê bila komitek navnetewî qerarê bide." Min nerî mejiyê wî linavhev ketîye, dilê min pê şewitî

-Ma tu çawa ketî vir? Yekî ku li te xwedî derkeve hene yan na?

-Yaho hûn çima min fahm nakin? Min ewqas sal jî Kurdan re got dewlet federasyon, otonomî nelazîme. Heta min got bibin Tîrk jî. Lê carekê, tenê yek carekê min go: "Ji Tîrkên kibrisê re dewlet ne gereke min avêtin vir. Bêbexta..

Hevalê min min bir cem ê din.

Yekî hûr û reşik. Serê her deqeyî berçavkên xwe paqij dikir.

Min nerî ku merivekî bêhale, ez bêtîrs nêzîkî wî bûm

-Merheba pismam. Çawanî?

Ez deh caran li pîrsa xwe poşman bûm.

Rabû ser piya, pêşîya ceketê xwe girt, berçavka xwe da ber çavê xwe û xwe wek dîkekî zeyfokî xij kir û destpêkir:

-Ez nizanîm bê çima ez livir im. Ez jî dost û hevalê xwe pir hez dikim. Min bi kesî re bêbextî nekiriye. Jiber ku qabiliyeta min jibona tu karekî tune, ez siyasetmedariyê dikim. (çi rast û çi xweş)

Wek hûn pê zanî em di pêvajoyek nû re derbas dibin. Ev pêvajo serê pevajoyekê nû ye. Di peyê pêvajoyê de wê pevajoya tofana Nûh Pêxember destpêbike. Wî çaxî emê rêxistinêkê nû ava bikin û di...

Doktor di ber xwe de go:

-Eger ez rojêkê jî van pêvajoyan tiştêkî fêhm bikim ezê mehekê herim betlanê.

Ê sistyan. Yekî dirêj û melûl bû. Bin çavên wî xelekên reş girtibûn, te digo qey deh salin li bin bedena Diyarbekirê esrar kişandiye.

-Merheba. Navê te bi xêr?


-Merheba. mmm navê min...

-Başê ez bi ber kê ve diçim tu tê û guhdarî dikî, sebaba wê çiyê?

Doktor milê min girt, min dîr xist û go: "Em bawerî ku ê sistiya merivê Tîrka ye. Wan jî serî heta niha bewer nekîrîne ku evê pêşîn zir dîne. Ê duduyan bixwe ne gelek bi aqile, lê dixwazin wî bixwe jî zirdîn bikin.

nirxandin

Ömer ÖZMEN



Jibo çi Şemzînan?

Jibo lidarxistina porvoqasyonan; hîlbijartina herema Şemzînanê, ne rastlêhatineke. Peyamên Serfermandarên Artêşa Tirk destnîşan dikin ku, provokasyon; bi plan û proxram bi taybetî hatiye lidarxistin.

Devera Şemzînanê, di tixûbê Başûrê Kurdistanê de cih girtiye. Noqteyek stratejîke. Ji berxwedana Şêx Ubeydullahê Neyrî vir de, di dîroka Kurd û Kurdistanê de rolek giring leyîstîye. Jibo vê taybetmendîya dîroki, rehên neteweperwerîyê, di kûrahîya axa heremê de aj daye. Liser vê axa pîroz, provoqasyona dijmin, carek din bi serneket

Çend roj beriya provoqasyonê Serfermandarek Artêşa Tirk, di derheqê midaxeleya Başûrê Kurdistanê de, jibo bersîva Serokwezîr Erdogan, ji çapementîyê re weha digot: "Gelo hîn wexta midaxelê nehatiye?"

Dema di pêkanîna provoqasyonê de terorîst liser sîc hatin girtin ji serfermandarê hêzên Bejayî Yaşar Buyukanit, li calakvanên terorîst xwedîderket û got "Ez wî serbazî dinasim û zarokêkî başe"

Herweha, li gorî hîyerarşîya rutbeyên leşkerî, di navbeyna Orgeneralek û Bînsarbaz de hevna, ne mimkîne. Buyukanit, raste rast liser lêpirsîna bûyerê, tehdîtan dibarîne.

Parazanê terorîstan jî, kevnêserbazek artêşê ye û, di dema borî de, li Kurdistanê şerê qirêj birêvebirîye û di Dadgeha Mafên Mirovan ya Ewropayê de, bi tawanbarîya şewitandîna gunda hatiye darizandin. Parazanê kevnêserbaz, li balafirgeha Wanê, jî terefê berpirsiyarê artêşê ve, bi fermî hatiye pêşwazîkirin.

Çawa tê iddîakirin, provoqasyona Şemzînanê, wek bûyera Susurlukê loqal nîne. Armanç û hedef, jî hevûdu cudane. Helwest û lîxwedîderketina Generalên Tirk destnîşan dike ku, navnîşana Provoqasyonê; Başûrê Kurdistanê ye. Dixwazin li tixûbê başûr di encama qetlîmekê de, bi destê Apoyîyan serhildanekê loqal lidarxistin û bi wê wateyê, leşker derbasî başûrê Kurdistanê bikin. Jixwe, konseptî Imralîyê jî, jî ve armançê ne dîr e. Herweha Pîstî tescîlkirina statuya başûrê Kurdistanê, çalakîyên PKK û Jitem ê, li heremê berfireh bûne. Çalakîyên herdu alîyan dişîbin hevdu. Gellek caran PKK li van çalakîyan xwedî derdikeve.

Ez dikarim bêjim ku, terorîstên Artêşa Tirk cawa liser sîc hatibin girtin, ew Apoyîyan ku digotin "Hikûmeta AKP ê dixwaze PKK û Artêşê bine hember hevûdu" jî ewqas liser sîc hatine girtin.

Pîstî eşkerebûna provoqasyonê; di nav xwepêşandanên protestokirî de, rewşa Aktorên Apoyî, yê li dijî AKP jî cudareng bûn. Dema rayedarên partîyê yê statukopere, li heremê di derheqê bûyerê de lêpirsîn çedîkirin, Apoyîyan; bi taybetî êriş dibirin ser heyeta AKP yê. Her çîqas xwedêgiravî jî AKP, jibo berjewendîyên desthilatdariya xwe, di nav hewildanê zelalbina provoqasyonê daye.

Wênayê di Şemzînanê de derketîye holê, carek din daye xuyakirin ku, Artêşa Tirk, jibo notralîzekirina tevgera bakur û sabotekirina statuya başûrê Kurdistanê; di bin qontrola xwe de, berdwamiya şer dixwaze. Ji 1 ê Hezîrana 2004 an vir de, di nav ve konseptê de, şer hatiye sazîkirin. Ev listik divê bête dîtîn. Di rayagîstî ya netewî û navnetewî de, teşhîrkirin û mehkûmkirina provoqasyonê, divê li gora vê rastîyê bê amadekirin.

Hevxeberata PDK-Bakur û PSK xurttir dibe

Pîstî îmzekirina protokola navbera PDK-Bakur û PSK, xebatên hevbeş ên herdu alîyan bi xurtî berdwam dikin. PDK-Bakur û PSK jibo ragihandîna xebata derbarê protokola xwe di 13ê Ciriya Paşîn 2005an de li bajarê Wuppertala Almanya civînek berfireh û vekirî lidarxistin. Civînê bala pir kesan kişand û wek peyivdar ji PSK Yilmaz Çamlîbel û ji PDK-Bakur jî Bayram Ayaz beşdarî civînê bûn.

Yilmaz Çamlîbel di axavtina xwe de bal kişand ser giringîya xebatên yekîtiya navbera Kurdan û got ku „ev sîh salin xebata yekîtiyê di rojêva Kurdan de ye lê mixabin heta îro yekîtiyêk rûniştî pêknehatiye.“ Herweha Çamlîbel bi berdwamî anî zimên ku „heta şaşîyên xebatên derbasbûyî neyên liberçavgirtin, destnîşankirin, rexne lixwe neyên girtin û îbret jî xeletîyên dema derbasbûyî neyên stendin, di xebatên yekîtiyê de serketina me ne mimkîne.“ Çamlîbel bi berdwamî agahîyek di derbarê xebatên derbasbûyî de da guhdarvanan û got „di dema buhurî de Kurdên dîndar bi dîndarên Tirk re, Kurdên sosyalîst bi sosyalîstên Kurd re, Kurdên liberal bi liberalên Tirk re, Kurdên alewî bi



alewîyên Tirk re hevkarî û xebat dikirin, di van xebatan de nasnameya Kurd herdem dihat lipaşxistin û jiber vê jî di çareserkerîna pîrsa Kurd de serketinek rastîn nehatiye bidestxistin. Jiber vê, êdî Kurd qebûldikin ku doza Kurd dozêk netewî ye, bi yekîti û bernameyek netewî çareser dibe. Di vê babetê de îmzekirina protokola navbera PDK-Bakur û PSK gavek giringe û divê ev gav jî alî hemî Kurdên welatparêz ve bê destekirin. Çamlîbel di civînê de giringîya yekîtiya navbera Kurdan anî zimên û herweha bi berdwamî got „divê berî her tiştî rewşenbîr û siyasîmedarên Kurd pîrsa „jibo kê, jibo çi û yekîtiyêk çawa?“ jixwe bipîrsin û bersîvek rast bibînin. Bi gotinek din divê em liser „divê krîterên

bingehîn ên yekîtiyê çi bin“ bifikirin.“

Pîstî axavtina Yilmaz Çamlîbel, Bayram Ayaz jî liser navê PDK-Bakur giringîya yekîtiya navbera hêzên Kurd anî zimên û got „yekîtiya netewî ya ku li başûrê Kurdistanê pêkhatiye bûye sebeb ku Kurd serketinên mezin bidestbixin û divê ev yekîti jî Kurdên bakur re jî bibe wek mînamekê. Konjonktura siyasî ya ku îro em tede ne rewşek avakirîye ku emê bi yekîtiyêk netewî karibin gellek tiştan qezenc bikin.“ Bayram Ayaz di derbarê bernameya yekîtiyê de jî got „herdu partiyan bernameyek çenekirine û bang li girseyê nekirine ku tev li ve bernamê bibin. Wê çerçewa bernama bingehîn a ve yekîtiyê di encama raberizandîna bi gîrsa gel re bê tespîtkirin û jiber

vê jî wê civînê agahdariyê berdwam bibin. Wê yekîti li gorî pêşniyaz, daxwaz, hêvî û rexneyên beşdarên şîkilî bistîne.“ Bayram Ayaz axavtina xwe bi van gotinan berdwam kir: „Wê giraniya xebata me li hindurê welêt be. Pûtepêdan û destekkirina gelê me yê li welêt jibo xebata yekîtiya me pir giring e. Lê erkên mezin dikevin ser milên me Kurdên diyasporayê jî. Em Kurdên li diyasporayê jî divê em di nava xebatek çalak de bin. Bi van herdu partiyan destpêkirina xebata yekîtiyê nayê maneya ku wê partî û welatparêzên din li derveyî ve xebatê bimînin. Jiber vê guman û sedemê xwe dîrkin an jî astengkirina xebata ve yekîtiyê nerast e. Divê her welatparêzê Kurd ê ku yekîtiyê diparêze tev li ve xebatê bibe.“

Îdarekarê civînê, Serokê Komela Piştîgiriya Hak-Parê Abdulkadir Aslan jî mebesta civînê anî zimên û got ku „armanca bingehîn a ve civînê eve ku guhdarvan dîtin, fikir û rexneyên xwe bêjin da ku em karibin encamekê jî civînê wergirin.“

Di civînê de zêdeyî sed siyasîmedar, nivîskar, rojnamevan, berpirsên sazîyên sîvil û rewşenbîrên Kurd beşdar bûn û di derbarê yekîtiyê de dîtin û rexneyên xwe anî zimên.

Cuma YAKUT

Di salên derbasbûyî de Partiyên Kurdan gelek caran bihevpeymanîyên hevkarî an jî yekîtiyê çêkirin. Lê mixabin ev peyman herdem tîkçûn. Ez dîsa jî civîna PDK-Bakur û PSK a liser hevkarîyê pozîtîf dinirxînim. Ew gavek jibo çareserkerîna kar û barê gele Kurde û hevî dide mirovan. Ez hevîdarim ku ev peyman û sozdan biserkeve û tîkneçe. Jibo ku ev peyman pêk bê, divê herdu partî di karên rojane û siyaseta xwe da bihevpeymanîyê û gavên pratîk bavêjin. Mirov kare çend pêşniyaran bike.

Herdu partî karin di avahîkê da bicîh bibin û hindêk karên xwe bihevpeymanîyê bimeşînin.

Peyama Kurd û Dema Nû jî alîyê teknîkî û xebatê de bihevpeymanîyê bikin. Nivîskarekî Dema Nû di Peyama Kurd de, nivîskarekî Peyama Kurd jî di Dema Nû de binivîsin û liser hevkarîya herdu partiyan û projeyên pêşerojê xwendevanan agahdar bikin.

Herdu partî karin bihevpeymanîyê kovar an jî rojnameyek mehanî çap bikin.

PSK û PDK Bakur divê li Ewropa hêzên xwe di xebata jibo civaka Kurd bihevpeymanîyê û sazîyên wek komelan yan bihevpeymanîyê damezrînin an jî cihên komal lê hene bibin endam û di nav xebatê da cih bigirin.

Li Kurdistanê bakur peywîste herdu partî bi sazî û partîyên din re jî, li rê û çareyên hevkarîyê bigerin û partî yek bi navê Kurd an jî Kurdistan damezrînin. Jibo partîyê Kurd dem hatiye û şertên wê hene. Pevajoya muzakerayan bi Yekîtiya Ewropa û dewleta Tirkîyê rêya partîyê Kurdistanî vekirîye. Ger hêz hebe PDK û PSK karin bi navên xwe li Kurdistanê bakur siyasîtek legal bikin û partîyên xwe eşkere damezrînin.

Disa komel û navendên Çanda Kurdî li Kurdistanê bakur divê bi navên Kurdistanî bînin damezrandin. Wek mînak li Diyarbekirê „Navenda Çanda Kurdistanê“ an jî bi navên din lê divê Kurdistan di navde be.

Ger mirov bixwaze hevkarîyê pêşda bibe peywîste mirov bihevpeymanîyê kar bike û sazîyan damezrînin. Bê

kar û sazî hevkarî liser kaxîzê dimîne û ewê tîkçûnê. Hevkarîya partîyan pîroze. Ez bi dil û can serkeftina wan dixwazim.

Dîtinên min liser civîna Wuppertal ya PDK Bakur û PSK

Dr med. Fikret Yıldız

Çavê min û çavê piraniya Kurdan li kiryarên rastî ne.

Berî her tiştî li welêt hevkarîyêk bi hemdî xwe di dezge û rêxistinanan da hewceye. Ew dikare HAK-PAR be dikare rojname be.

Li Ewropa jî li derên ku KOMKAR heye di Komkaran da, yê tuneye da bi tevhev û bi welatparêzên Kurdan din va avakirina komelan e.

Jiboyî ve jî avêtina gavên rastî hewce ye, jî herdu alîyan da jî. Ew kesên ku rêberîyê dikin gerek berî herkesî ve bikin. Jibo ku gel jî li dû wan bê.

Ew ne bese ku bibêjin lê ew bixwe nekin.

Ez wek kes û wek Serokê Gistî yê KOMKAR Almanya li benda van gava me.

Cîgirê Serokê Sendikaya Rojnamenivîsên Kurdistanê Salih Kerîm:

Mafê her Kurdekî heye bibe endamê me

Liser daxwaza Navenda Lêkolînên Kurdî li bajarê Bonn, li destpêka meha derbasbûyî nivîskar û rojnamenivîs, mamoste Salih Kerîm Cîgirê Serokê Sendikaya Rojnamenivîsên Kurdistanê û Cîgirê Sernivîskarê Rojnameya „el-itihad“ gihîşt Elmanya. Peyama Kurd jî ev serdan bi derfet zanî, jibo ku di derbareya Sendikaya Rojnamenivîsên Kurdistanê de, çend pirsan arasteyê heja bike. Di serî de me jî heja xwest ew liser çawaniya damezrandina vê sendikayê hinekî me ronî bike;

Salih Kerîm: Hûn dizanin ku Kurdistan di van çend salên derbasbûyî de, di rewşeke ne asayî de derbas dibû. Vê rewşê tesîra xwe liser hemû aliyên jiyane hebû bi taybetî liser rêxistiyên pêşeyî. Mesela li Hewlêrê rêxistiyek bi navê Sendikaya Rojnamenivîsên Kurdistanê hebû û li Silêmaniyê jî yeka din hebû bi navê Yekîtiya Rojnamenivîsên Kurdistanê, lê bi hêzek paqij û hestek niştimanperwerî, em herdu alî di kongireyek yekgirtî de li 13/11/2005an li bajarê Hewlêrê, şiyar herdu sendikayan bikin yek. Me civatek hevbeş hebijart û li gorî biryarên kongireyê me çend şaxên sendikaya xwe li Bexda, Mûsil, Kerkûk, Duhok, Silêmanî û Ewropa jî ku biroya wê li London e, damezirand.

Peyama Kurd: Çima şaxê sendikaya we li Hewlêrê tune?

Salih Kerîm: Em niha mijûlî vekirina şaxê Hewlêrê ne, belkî piştî zivirina min amadekarî jibo vekirina Hewlêrê temam bibin.

Karên şaxê Ewropa çine?

Karên şaxê Ewropa taybete bi wan rojnamenivîsên li Ewropa dijîn, bi rêya vê şaxê û li gorî wan mercên ku di peyrewê navxweyî yê sendikayê de heye, ew dikarin di sendikayê de bibin endam.

Ew karên herî girîng ku we ji endamên sendikayê re kirine û di pêşerojê de jî hûnê bikin çine?

Ji wan karên ku heya niha me ji endamên sendikayê re kirine, dabinkirina parçeyên erdî û parêzvanîya wan rojnamenivîsên ku liser karê xwe yê rojnamevanî dikevin nav pirsgerêkan li dadgehan. Herweha em alîkariya wan dikin dema nexweş dikevin û hin çaran di dema jinanî de yan dema ku belayek bi serê wan tê. Ev jî gişt jibo erk û mandibûna rojnamenivîsan destkefte.



Gelo ji aliyê yasayê ve, ev sendika bawerpêkiriye û projeyek wê ya yasayî heye?

Belê ev sendika ji aliyê yasayê ve bawer pêkiriye û me kariye ji parlemena Kurdistanê yasayekê derxînin. Li gorî vê yasayê her rojnamenivîsek bixwaze li saziyek hikumî kar bike, wê salên xizmeta wî yên rojnamevanî jê re bèn hijmartin. Hem jibo mochey 'meaş' û hem jibo dema xanenişiniyê 'teqaud'ê. Ev jî jibo bilindkirina astê jiyanê rojnamenivîsan karekî gelekî girînge.

Hejmara sercem endamên sendikayê çende û mercên endametiye çine?

Sercem endamên sendikayê nêzî du hizaran in, mercên endametiye jî li gorî peyrewa sendikayê, her rojnamenivîsekî Kurd jî her beşek Kurdistanê hatibe û li Kurdistanê rûniştî be mafê endambûnê heye. Herwusa her rojnamenivîsekî ne Kurd ku li Kurdistanê rûniştî be, mafê wî jî heye di sendikaya me de bibe endam. Herwusa hemû rojnamenivîsên Kurd ku li Ewropa dijîn bê cudahî mafê endametiye heye.

Cudahiya di navbera sendikaya Kurdistanê û Iraqê de çiyê?

Ez dixwazim vê bi çend xalan ronî bikim, yekem sendikaya me serbixweye û tu peywendiya me bi sendikaya Iraqê re tune. Duyem Sendikaya Rojnamenivîsên Kurdistanê di Sendikaya Rojnamenivîsên Navnetewî de

endame. Lê sendikaya Iraqê jiber pirtirbûn û tevliheviya wan, heya vê demê sendikaya navnetewî ew wek endam wernegirtine. Sendikaya Iraqê daxwazkiriye ku peywendiyê bi me re girêbidin, lê me jibo wê peywendiyê mercên xwe hebûn û me gotiye em sendikayek serbixwene, hûn jî serbixwene û em tucarî qebûl nakin em bibin şaxekî sendikaya Iraqê. Êdî ew roj nema ku em bi yekî mîna Taha Muheyedîn Maruf razi bin ku hûn jî me re danin, herwusa me jê re gotiye her dema we karî hûn sendikayek yekgirtî damezrinin, emê jibo giftûgoya birûbaweran, serdan û şandina kadirên rojnamenivîs jibo derveyî welat jibo kursên rojnamevanî, komîteyek hevbeş damezrinin.

Jibo çi sendikaya rojnamenivîsên Ereba liser endametiya sendikaya we, ne razibûna xwe ji sendikaya navnetewî re nişan da?

Belê sendikaya Ereba helwestek gelekî xirab nişan da, lê bi hîmeta hemû aliyên û dostên gelê me ji rojnamenivîsên me yên li Ewropa, me karî em bersînga vê helwesta şovîni bigirin û rojnamenivîsên Ereba Iraqî yên pêşkeftinxwaz jî ku hejmara wan nêzî 40 kesian bû, yadaştnameyek 'muzekereyek' da sendikaya Ereba û nerazibûna xwe ji helwestê wan re diyarkirin. Me jî wek wefadarî jibo helwesta wan ya camêrane bi biryara desteya bilind biryar da em van 40 nivîskar û rojnamenivîsên Ereba yên Iraqî wek

endamên fexrî di sendikaya xwe de werbigirin.

Erê çi çaran hûn û sendikaya Ereba rû bi rûyê hev bûne?

Belê di kongireya Etîna ya paytexta Yûnanê de, me helwesta xwe bi eşkerayî û rastgoyî ji wan re ronî kir. Di encamê de Felestîni, Cezayîrî û Marokiyîyan peşmaniya xwe ji me re nişand û gotin ev biryar bi ser mere bûriye û bê aghdariya me ev biryar hatibû standin. Ya herî tund nûnerê Tûnis bû ku gelekî bi şeweyekî şovîni reftar dikirin. Lê tiştê xweş di wê kongireyê de ew bû ku desteya bilind ya kongireyê dixwest Tûnisê ji sendikaya navnetewî derxîne, jiber ku ew Tûnisê weke welatekî kujera azadiya hizrî dinasin û sendikaya Tûnis 'belgê zêrin' weke diyarî

ji Serokê Tûnisê Zeyn el-abidin bin Elî re pêşkêş kiribû. Loma sendikaya cihanî ew weke qûrya rijîma Tûnisî tawanbar kir, bi vê jî helwesta wan gelekî lawaz bû li beramber me û beramber sendikaya navnetewî.


Jibo vê helwesta Ereba, sendikaya navnetewî çi bersiv hebû?

Dixwazim amajeyê bi xaleke girîng bidim û bêjim ku rewşa Sendikaya Yekgirtîya Ereba di vê kongireyê de gelekî ne rêkûpêk û lawaz bû û bersîva birêz Aydın Wayd Sekriterê Rojnamenivîsên Navnetewî di vê derbareyê de gelekî pozetiv bû. Di kongireya Eyîna de birêz jî birêz Ferhad Ewnî Serokê Sendikaya Rojnamenivîsên Kurdistanê re got; dixwazim ku hûn vê helwesta Sendikaya Ereba bi girîngî wernegirin, çunke mafê wan nîne ew bi çi şeweyekî destê xwe bêxin nav karûbarên me, lewra ez ji we daxwaz dikim ku hûn vê meseleyê jibîr bikin û hûn endamên sendikaya navnetewî ne, hûn ne endamên wan in.

Peywendiya we ligel çiranan çawayê?

Peywendiya me başe, her jibo nimûne ez dibêjim wê li van nêzikan Yonan û Turkiya serdana me bikin û beriya niha jî şanda Îranê serdana me kiribû, ji Ereba jî peywendiya me bi Urdinê re başe û biryare li van nêzikan ew jî serdana me bikin.


**Hevpeyvîn:
Loqman Berzincî**



Bêje

Diyarbakir - 8-

Selim Çürükkaya



Bi qêrîna Mewlut Çawîş "Amade be kuro!" re ji xem û xeyalên xwe derket û dît ku ew di hucreyê de ye.

Radibe ser xwe û amade dibe.

Bi kilileke hesinî, deriyên hesinî tîn vekirin.

Adem derdixin salonê.

Serperîştê komê Mewlut Çawîş, bi deng û rengê nermik:

"Efendî hûn dixwazin li kîjan qawîşê bimînin?"

Lê êdî Adem ji deng û rengên nermik bi guman e.

Ew ne bi nê e ku here qawîşên bi himam (!) û bi televizyon (!).

Serê xwe dixwe ber xwe û dixwaze dudiliya xwe veşêre.

Dema ku ew bi dengê Karabela "Bêje kuro nûtik!" re vediciniqe, gotina "Ez nizamim" ji nava lêvên wî tê xwarê.

Di nava kulm, şeqam û pehînan de, ew tédigihê ku Mewlut Çawîş dîsa amadekariya dek û dolaban dike. Mewlut Çawîş dibêje:

"Baş e kuro! Emê te li temamê qawîşan bigerînin. Te kêjan eciband tu yê li wir vehesi!"

Ademê ku haya wî ji senaryoya ku tê amadekirin tune ye, neçar e ku fermanan bi ci bîne.

Mewlut Çawîş:

"Raweste!"

Adem, lingên xwe weke leşkerekî vedike û dikeve pozîsyona rawestanê.

Mewlut Çawîş:

"Amade be!"

Adem dikeve rewşa amadebûnê.


Mewlut Çawîş:

"Ber bi qawîşa sêyemîn ve bimeşe, bimeşe!"

Adem weke leşkerekî nû, bi tirsonekî û lerzîn lê bi gavên nîzami di korîdora dirêj de dest bi meşînê dike.

Li Şemizdînan çî dibe?

Li devera Hekarya, ji sala 1958an û hêveve (virde) awarteya ne beyankirî heye. Jiber ku dever di navbera hersê dewletên koledar daye, di ve deverê de Kurdên hersê parçeyan heta niha jî zozan, çêre û dûringehên xwe liyve nekirine (parve nekirine) û malê eşîranin. Lê eşîr hinek wî alî û hinek jî li vî alî parve bûne. Di bûyîn û qewimandinan, di rojên xurab de, ji vî alî û wî alî diçine hewara yêk. Kesên ku ne ji devera Hekarya bin, hewce ye ji deverê derbasî aliyê din bin. Di 1958an de ku şoreşa Barzanîyê mezin destpêkir, gelek kesên devera Hekarya tevli şoreşê bûn. Her wusa heta Kurdistanê başur azad bû jî şoreş bi alîkariya deverê dihat xwedikirin, hemî hewcedariyên şoreşê ji wê deverê derbas dibûn û digihîştin şoreşê. Di hersê parçeyên Kurdistanê de çu partî û rêxistin nemane ku ketibin tengazîyê û devera Hekarya alîkariya wan nekiribe. Lewma li ber çavên koledarên hersê parçeyan dever cihê herî stratejîk e. Her wusa jibo Kurdan jî wusaye. Ji 1958an û virde, li bajarokên Culemêrgê Giredeyî re (derveyî Geveerê) serê malê ji hewcedariya malbatê pêve tişt kirin qedexe bû, heke ji malekê re 10 torbe arvan hewce ban, nikarîbû bike 11, he ke 6 cot pêlav (sol) hewce ban nikarîbûn bikin 7. Jiber ku qereqolê jê distandin. Jibo qeza Çelê û Şemizdînan heke kesek nejtî, li wê qezayê ba, hewce bû ji waliyê Culemêrgê belgeyek standiba ku ev kese, jibo filan şolî diçe filan qezayê. Ev tişt bixwe bi serê min jî hatîye. Bawer dikim sal 1965 bû, jibo boyaxkirina xaniyê tendurustîya Çele (Çukurca) bi mitahîdê wê Macîd Beg re çûm cem waliyê Culemêrgê, me pelga çûndina Çelê stand. Jiber ku dever hinde stratejîkê û destxistiyên Kurdistanê azad çirûskên xwe dide deverê û hatin-çûn zêde jibo Kurdistanê azad



Xalidê Hekarî

ji deverê dibe, senpatîya deverê dîsan derdikeve digehe asta berê û hêdi hêdi ji bin qontrola PKK û dewletên koledar derdikeve. Jibo pêşîya wê bigirin dest bi vilik û hilan dikin, proveqasyonan pêk tînin, hela hela piştî Mam Celal bû serokê Komara Iraqê û Kek Mesud jî bû Serokê Herema Kurdistanê û çûn Amerika û Brîtanya. Ji aliyê serokên wan herdu dewletan bi "Serok" jî wan re hitap kirin, îcar Tirk û hevalbendên wan dîn û har bûn. Jibo ku qontrolê dîsan bi temamî bêxin destê xwe jehr û kîna xwe ya li hemberê Kurdistanê azad dixwazin bi xelkê deverê birêjin.

Li Şemizdînan hindêk gund hene ku di navbera sê dewletên koledar de hatine liyvekirin (parvekirin). Ev gundene, rêgeha Kurdên hersê parçeyên Kurdistanê ye, di van gundan de, di van salên dawîde rojê bi tenê ji derdora Culemêrgê û Wanê 200-250 kes bi qaçaxî diçine seredana Kurdistanê azad. Kesên diçine Kurdistanê azad û tîn gelek di bin tesîra rewş û destxistiyên Kurdistanê azad de dimînin. Her çend piraniya wan hevalên

PKK jî bin, lê ku ji wir vedigerin dilê wan li Kurdistanê azad dimîne. Mejiyê wan tevlihev dibe, dilgermî û hezkirinek jibo Kurdistanê azad çêdibe. Ev tiştene di nava gelê Hekarîya jî belav dibin, di rew û antîpropaganda PKK û ya dewleta Tirkan derdikeve holê, li hemberê wan antîpatîyek çêdibe. PKK û dewleta Tirkan ya kûr wisa bawer dikin ku wê çirûskên tirêja azadîya Kurdistanê başûr jî Hekarîyan belavî Kurdistanê bakur bibe û wusaye jî... Lewma PKK û dewleta Tirkan ew rewşa awarta ku di nav Tixûbên Hekarya jî 1958 an vir de danîne û van heyaman hinekî sist bûye careke dinê bişên bişidînin. Li wê deverê provokasyonan pêktînin, da ku bişên hatin-çûnê bibirin û xelkê Hekarya careke din bexine bin sîvanka PKK û bi vî awayî di binê qontrola dewleta Tirkan ya berpenî (dizî-kûr) de bihêlin.

Ev bûyerên ku li Şemizdînan, Geveer û Culemêrgê dibin ji aliyê PKK û dewleta Tirkan ya berpenî tîn kirin. Yek aliyê her du alî jî (di eslê xwe de yek alî û du beşe) hevûdu tawanbar dikin. Lêre serpehatiyek ji aliyê Batmanê hat bîra min.

Di sala 96an de li Batmanê PKK digot bi şev Batman di binê qontrola me deye, bi roj jî di destê dewletê de ye. Li wê demê li Batmanê rojê çend kesên ronakbîr, rojnamevan, rewşenbîr dihatin revandin. Paşê jî cenazê wan li devereke dihatin dîtin. Herdu alîyan jî tewan dihavêtin stukê yê din. Lewre jêre digotin "Faîlî meçûl". Di qehwexanê Batmanê de hinek kes ji yekî sefiqil (niv dînik) dipirsin: "Aqilê te çî ji van faîlî meçûlan dibire kî, kî van tiştan dike?" Yê dînik: "Ez tiştêkî nizamim û nabêjim. Tiştê ez dizanim gerilla plan dike, qontra pêktîne, qontra plan dike gerilla pêktîne. Lê ez dîsa jî tiştêkî nizamim û nabêjim!"

Divê Kurd li Şemzînanê xwedî derkevin

Dewlet li Şemzînanê Hekarîyê liser sûc hatiye girtin. Armanca êrişan pirtûk, ronakbîrî û Kurd in. Bi salane ku civakek şiyar dibe, ronak dibe û li mafên xwe yê demokratîk xwedî derdikeve. Jiber vî jî dewlet jî vî civakê ditirse û çalakîyên terorê bikartîne. Herkesê ku ji xwe re dibêje ez ronakbîrim, demokratîm, welatparêzim divê tiştêkî li hember terora ku liser gelê Kurd tê kirin bike.

Li Wanê şewitandina Kultur Kitabevi û tehdîtkirina xwediyê wê Nûri.Erdogan eynî zihniyet e. Li Çewlikê (Bingolê) revandina xwediyê pirtûkxanê Sabrî Kizilkan û li Norşînê kuştina wî eynî hêzên ewlekariyê (!) bûn. Ew hêzên ewlekariyê ku dibin sedema bêewlekariyê û hizûra xelkê direvînin, bi salane jî alî dewletê ve tîn xwedikirin. Bi serê xwe terorîstin, çetene û hêza bêedaletê ne. Ev hêza tarî jî alî dewletê ve tîn payedarkirin û wek hêmenên (eleman) bi şeref tîn bilindkirin.

Bi salane şoven û neteweperestên Tirk hatin pîrozkirin. Li Kurd, Ermenî, Rûm û grûbên etnikî û olî heqaret hatin kirin. Pirtûkên ku di derbarê wan



Ahmet Onal

de hatin weşandin hatin komkirin, şewitandin. Xwediyê weşanxane û pirtûkxaneyan hatin girtin, êşkencekirin û hepsikirin. Ev mexdûr wek terorîst hatin destnîşankirin û wahşeta liser wan hat veşartin.

Delîlên ku li Şemzînanê derketin holê, ji tîkiliyên bûyera Sûsûrlûkê kûrtir in. Heger ronakbîr, saziyên mafê mirovan, însiyatîfên sîvil neçin ser bûyerê, wê dewlet mîrkuj û delîlan veşêre û sergirtî bihêle. Divê hemî saziyên mirovî û demokratîk li xelkê Şemzînanê xwedî derkevin û ronahiyê biparêzin. Divê hemî saziyên weşan û çapemeniyê xwedî li hevalên xwe yê ku li Şemzînanê hatine qetilkirin derkevin û li hember vî bûyerê helwesta xwe deynin.

Divê bi helwesta ronakbîr û awiragelempirîya demokratîk bê nîşandan ku pirtûkfiroşên Şemzînanê û yê wek wan ne bitenê ne. Wê ev helwest bibe temîna jiyanê mirovî û demokratîk.

Xwedîlêderketina tekoşîna mafdar a xelkê Şemzînanê erke mirovatî ye.





Jinekolog, mêrekolog, dinckolog. Prof. Dr. **Fatê Were Civatê**

Xaltika Fatê, Ev Kek Mesûd û Mam Celalzordane diplomasiyê ma xêr e? Serok Bush, Tony Blair, Angela

Şêxbat

Merkel, Eli û Welî, û niha ji Pappal Gelo tu dibê wê xêrek ji van gawiran bigihê me Kurdekan qurban? Çima ma ku çûbana cem Kerdaxan, Beşar û Ehmedînecaf ne çêtir bû ji wan gawiran? Ma tu dibê wê Kurd bibin fileh û dev ji misilmantiyê berdin gelo? Bi xwedê ez pêşeroja me nebaş dibînim haal De ka fala qereçiyê veke û rimla xwe bavêje porkurê!

Mela Cewadê Şaşikmezîn / Hewlêr

Ya Hazretî Melayê Şaşikmezîn, ê lawkê mino, me bi salan xwe avêt ber lingê siyasatmedarên misilmanekan, lê ewan hertim em kirin "Tirk, Ereb û Ecemên çiyayî" û gotin "kaka, em hemi brayên hev in, em misilmanin, jixwe va dewleta me Tirk, Ereb û Eceman heye, hewceyî bi dewletek Kurd nîne!" û em destvala vegeandî. Me xwe avêt bext û ocaxa Mela û Şêxên misilmanekan û me doza mafê xwe li wan kir. Ewan herdem gotin "Neûzûbilleh, dewleta Kurd herame, em misilman têra xwe hene, hewceyî bi dewleta

Kurdên misilman nîne!". Îcar ya Melayê Şaşikmezîn, hey ker kurê kerê, ma heta kengî wê misilmanekan li te siwarbin oxlim! Heta kengî tê bi pere û derewên wan şaşika xwe mezin bikî lao! Ê me jî dît go çara me ji destê Bîn Ladîn û Zerqawî tuneye, îcar me jî berê xwe da fileh û gawiran, ma naxwe em çî bikin hêê!? Bi serê te yê vala, di warê siyasî de gawir Serok Bûsh mohra xwe li pişt me xist. Siyasiyen me qezenckir îcar mabû dîniyen û emê wê jî bi saya Mam Celalekan û Pappayekan pêkbînin. Pappa bi serê elokan sûnd xwariye û soz daye Mam Celal go pirs-girêka Kurd bighîne Îsa û Meryem! Îcar Melayê Şaşikmezîn, wê şaşika xwe deyne û hinekî jî Incîlê bixwîne, şeş mehan bibe fileh û gawir. Heger te xêr tede nedît, dîsa rahije şaşika xwe û vegere ser mînbera xwe û dîsa dest bi derewan bike!

Xaltika Fatê, birastî ez ji te xeyidîme û dilê min ji te maye. Ez mirîdê te me û bi şev û roj ayetên te dixwînim. Min digot qey tê rojekê di diwana xwe de çih bidî min û min bikî sekreterê xwe. Lê min bihis-tiye te Eli Daxlî kiriye sekreterê xwe û te ez jibir kirime. Ma ev wijdane? Ma çî min ji Daxlî û Maxlî kêm-tire hêê? Birastî tu jî û ayetên te ji li ber çavên

min bûn wek "ayetên Salman Ruştî" û ez dibêjim ezê ji iro û pêde ayetên Salman Ruştî bixwînim! De ne bi xatirê te!

Welî Ayetparêz / Berlîn

Lao Welîyo, hey nankor, tu bi xêra ayetên min bû zilam îcar niha tu pozbilindiyan dikî ne! Hey bê wijdan, ez wek hinekan li mirîdan nagerim oxlim, ez li genelsekretêran digirim, li serokan digirim, li generalan digirim, ma ezê çî bikim ji mirîdên wek te ayetparêz hêê! Ma ji mirîdan pirtir! Ez geryam negeryam min ji Elîkê xwe pêve kes nedît go karibe sekreteriya min bike. Generalên me hemi ketine malperên internetê û ji xwe re bi fûtbolê dilîzin. Bawerke heger xaltika te Fatê bimre wê Elîkê min bibe Fatê 007! Jixwe jibo ce-ribandinê min ew şandiye Erbilê, heger karibe Zerqawî bi saxî bigre bi serê min û te emê wî bikin Serokê Rêxistina Taybet a Fatê! Îcar Welîyo, ezê şertekî bavêjim ber te, heger te tê derxist ezê te jî bikim cîgirê sekreterê xwe Elî. Pirs min ev e: Elî Daxlî çima neçû Hong-kongê lê çû Erbilê? Te go ayetên Salman Ruştî? De ser xêrê be reb-bî, belkî hema topa Xumeynî li bin guhê te keve û em ji mirîdên wek te xelas bin!

fate@peyama-kurd.com

Remildank



Beran (21.03-20.04)

Hûn berpirsariya xwe zanin. Berî go hûn liser projeyê serê xwe bêşînin, baş bifikirin.



Gamêş (21.04-20.05)

Di warê aborî de pêşketinê baş dixuyin. Radestî xwestekên xwe nebin, bi hemd bilivin.



Cewî (21.05-21.06)

Têkiliyên xwe û dost û xwe-diyên xwe xiranekin. Nûçeyên dîriyê hene, rêwîti dixuye.



Kevjal (22.06-22.07)

His û zîzbûna we zêde dibe. Bala xwe bidin kar û mala xwe. Xwîngerm nebin, berfireh bin.



Sêr (23.07-22.08)

Hûn afirandin in, lê lingên xwe zêde dirêj nekin. Çavê derûderê liser we ye. Haydarê xwe bin.



Simbil (23.08-22.09)

Hûn vê heftê kêfşa ne. Enerjiya we zêde ye. Bi hêrs nebin, hinek terz û adetên xwe biguherin.



Mêzên (23.09-22.10)

Pirsgirêkên xwe ji herkesî re ne-bêjin. Dost hene, dijmin hene. Berî herkesî li xwe bifikirin.



Dûpisk (23.10-21.11)

Liser projeyên xwe rawestînin. Hinek nûçe karin we têxin heyecanê. Erênî bin, bê hêvî nemînin.



Kevan (22.11-21.12)

Pirsgirêkên navmalbatî mezin nekin. Di bin bandora hissên xwe de nemînin, ruhtenik nebin.



Kovî (22.12-19.01)

Hinek bûyer bandorê li we dikin. Xwestekên we zêde dibin. Radestî bûyeran nebin.



Satîl (20.01-18.02)

Di aborê de nîşanên erênî dixuyin. Hûn di bin bandora teknoloji û nûjeniyê de dimînin.



Masî (19.02-20.03)

Hûn ji acizî û tengasiyê xilas dibin. Kirinên xwe li bêjîngê xîr, xwe bipîvin, xwe zelal bikin.

Pêkenok

Keroşk


Evdo çûye nêçîra keroşkan. Kirye nekiryê keroşkek nekuştîye. Hatiye cem qesab û keroşkek rût û mût kirîye û çûye malê. Jina wî Fato jê dipirse:
-Kuro peppûko ev çî keroşka taziye lao?
Evdo lê vedigerîne:
-Keçê lê nepirse, min ew di ser jînkê de girt, rebeno wext nedît derpiyê xwe li xwe ke

Çengelpirs

Minnet, sergirani	Vajayî, tersî	Riya balafir û gemiyan	Serokê belediyê	Meha sêyem Normale	Liytikvana l wêne	Navekî jinên Ewropî	Temrîn, bendeparêzî
					Hêvî, daxwaz		
Bêçav, ama			Rûniştvan, warcîh				Tepikên rîxê
Nehiyek Mêrdîne, bê bizir				Li Kurdistanê eşîrek	Zagon, qanûn		
			Bajarekî Kurdistanê	Destnîşaniya sergirtî		Du tîpên "endam"	
Wext, kat, dem	Pronavê yekem	Deng, seda Bi lez, ecele			Li Swîsreyê çemek		Mecnûn, evîndarê dilperitî
				Sê tîpên "olva"		Heywanek Dengê êşê	
Gundên biçûk Pirç, tayê por		Pêlava ker û hespan Tîpa dehem			Helbestvan		
			Kurtkirina Îsa	Diwanzde meh	Şerxwazî, sedemdtin Ap, mam		
			Pêxemberek			Kar, xebat	Nîşanka kesê sêyem Nex, benê zirav
			Nîjadek				Nîjadê Kurda
			Bizir, kok, bingeh				
					Serkarê pez, dengbêjek		



Bajar bi bajar Kurdistan Agirî



**Amadekar:
Mehmet Çetîntaş**

Bajar navê xwe ji Çiyayê Agirî digre. Navê bajêr yê herî kevn bi farisî „Kûhî Nûr“ yanî çiyayê Nûr bû. Ararat jî navek wî yê herî kevnê. Bi zimanê Ermenî „Masis“, bi zimanê Erebi jî jê re „Cebel el Haris (Agirîya mezin) û Cebel el Havayrîs (Agirîya biçûk) dihat gotin. Tirk dibêjin „Agirî“ û Kurd jî Agirî dibêjin.

Agirî di dîrokê de bûye wargehê gellek nijad û milletên cûrbecûr û jiber vê jî bûye yek ji şanoya şaristaniyên herî kevnare. Piştî hilweşandina hêzên şaristaniya (medeniyeta) Hîtîtan, di navbera Berî Zayînî -B.Z.- 1340 û B.Z.1200î de ketiye destê Hûrîyan. Jiber ku navenda qraliyeta Hûrîyan li Ruhayê bû û dûrî Agirîyê bû, nikaribûn Agirîyê di destê xwe de bihêlin. Piştî Hûrîyan Agirî ketiye destê Ûrartûyan û di navbera B.Z. 825 heta B.Z.786an hikumdarî



lê kirine. Piştî Ûrartûyan Agirî demekê kurt ketiye bin hikumdariya Kîmmeran (B.Z. 712). Piştî hilweşandina Împaratoriya Asûr, Împaratoriya Medan xaka xwe berfireh kirine û di navbera B.Z.708 - B.Z. 555ande Agirî xistine bin hikumdariya xwe. Bi hilweşandina Împaratoriya Medan re Persan, nêzîkî 200 salî Agirî di bin hikumdariya xwe de hiştine. Piştî ku Îskenderê Mezin zora qralê Persan Dariûsê sêyem bir (B.Z.331) Agirî dikeve bin destê Îskenderê Mezin. Piştî mirina Îskender Agirî bi dorê dikeve bin destê Împaratorî û qewmên cûrbecûr.

Herêma Agirîyê di dema Hz Osman de ji alî artêşa îslamî ve tê dagîrkirin. Heta sala 872an di bin hikumdariya Abbasîyan de dimîne. Piştê dikeve bin hikumdariya Împaratoriya Bizans û çend qewmên din.

Piştî şerê Melezgirê (1071) Agirî gav bi gav dikeve bin hikumdariya qebîlên Tirka. Bi dorê Sokmeni, Atabeki (1027-1225), Cengizî (1239), İlhanî (1256-1358), Celayirî, Timûrlengê Moxolî (1393), Karakoyûnî (1405-1468), Karakoyûnî û wekî din. Piştî şerê Çaldêranê (1514) Yavûz Sûltan Selîm Agirîyê dixwe nav sinorê Împaratoriya Osmanî. Di dema Osmanîyan de navê wê dibe şorbûlak, piştê Karakîlise û piştê jî Karakose. Jiber ku di Tevratê de jiber Tofana Nûh Pêxember navê wê wek Ararat derbas dibe, rojavayîyan jî Agirîyê re Ararat jî dibêjin. Navê Ararat jî Kurdî ye û tê mana agirê binê erdê ango Agirî (AR-agir RAT kok, bingeh, hîm).

Agirî di sala 1869an de bûye nehîye û di 1927an de jî bûye navenda bajêr.

Pîvana erdê bajêr 11066 km² ye. şiklê erda bajêr % 46ê wê ji mêrd û çîmenan, % 3 jî golan, % 25 jî deşt û zozanan û %25 wê jî ji çiya û zinaran pêk tê. Li herêmê genim, ceh, pincarê şekir û keten tèn çandin.

Li herêmê hewarengîyek (îklîm) bejayî (reşayî) hikum dike. Bajarek herî sar jî yê Kurdistanê ye. Salê şeş mehan berf li erdê ye. Havînan jî herêm hênîk derbas dibe.

Li derûdora Agirîyê ev bajarok hene:

- ◆ *Giyadîn (Diyadîn)*
- ◆ *Bazîd Navçe 93 km li rojhilatê Agirîyê ye. Tirba Ahmedê Xanê li vire.*
- ◆ *Zêdkan (Êleşkirt) 34 km li rojavayê bajêre.*
- ◆ *Xamûr (Hamur) 15 km li başûrê bajêre.*
- ◆ *Patnos 82 km li başûrê bajêre.*
- ◆ *Avkevîr (Taşlıçay) 32 km dûrî Agirîyê liser rêya Erzirom - Iranê ye*
- ◆ *Tütax (Tutak) 43 km ji Agirî dûre.*

Deşt û Zozan

Dešta Zêdkan û Karakose yê herî mezinin (341m²).

Dešta Patnos û Giyadîne Bilindbûna zozanên herêmê digihîjin heta 2000 m yî. Li wân zozanan „kanîyên ku avcemîdî û mêrgên şîn jî hene.

Taybetmendiyan bajêr

Nifûsa bajêr bi tevayî musulmanin, hejmara xiristiyanan pir kêman. Piraniya nifûsê jî Kurdan pêk tê, Azerî jî wek ciwaka duyemîn li herêmê hene. Çiyayê herî bilind ê Kurdistanê li Agirîyê ye. Çiyayê Hama (3243m), Çiyayê Kose (3430m), Tendûrek (3542m), Agirîya biçûk (3925m), Agirîya Mezin (5165m). Çiyayê Agirîya mezin, çiyayê herî bilind ê Kurdistanê ye.

Çemê herî mezin ê herêmê, çemê Mûradê ye. Wekî din çemê biçûk jî li herêmê peyde dibin. Hinek jî wan ev in; şêriyan, Zêdkan, Gelûtan. Li herêmê du golên biçûk jî hene. Balik û Saz.

Hersal jî welatên cuda pir turist tèn herêmê jibo ku hilkişin ser Çiyayê Agirî. Qesra Îshak Paşa jî cîyê ku ji alî turistên ve tê ziyaretkirin. Germavên Giyadîn û Dambatê jî cîyên xwehêsanê ne. Agirî jî alî madenên binerdin ve herêmek dewlemende. Li Giyadîne kurt, li Bazîde ponz, li Tütaxe xwê, li Avkevîre ava madenê û li Zêdkanê jî lînyît jî bin erdê derdikeve. Nifûsek bilind jî ya Agirîyê bi xwedîkirina sewalan (heywanan) mijûl dibin. Li vê herêmê sewal û teyrikên wek ordekên kovî, qaz, kew, gur, rovî û wekî din peyde dibin.

Çiyayê Agirî di dîroka Kurdistanê û dinyayê de cîyekî pîroz digre. Hem jiber girîngiya Tofana Nebî Nûh û hem jî jiber serhildana Agirîyê ya 1929-1931ê Çiyayê Agirî û bajarê Agirî jibo Kurda wek herêmek pîroz tê qebûlkirin.



Geschäftsführer: Balsam El-Fauzan

Tel.: (069) 68 30 73
Mobile.: (0171) 9 30 41 26
Fax: (069) 68 09 17 67

Deutsche Bank.
 Konto-No.: 250 577 4, BLZ: 500 700 24
 Wilhelm-Leuchner-Str. 7,
 60329 Frankfurt am Main

✓ **Her Duşem**
 Ji Frankfurtê di 23:55 an de difire û di 07:20 an de digihê Hewlêrê

✓ **Her Pêncşem**
 Frankfurt 06:15 difire- Hewlêr 07:20 digihê

✓ **Cîhê Kurdistan Airlines**
 li Balaxirxana Frankfurt am Main
 Terminal 2 E
 Schalter: 957 û 958

Kurdistan Airlines كوردستان

Zelal



Navenda Zelal

Liza GmbH
Köpenicker Str.
22-25
D-10997 BERLIN
Tel: 030 390 380 30
Fax: 030 390 380 84

Bayiyên Zelal

AKCAN GmbH Hamburg Tel.: 040 723 402 96	ESD Softdrink GmbH Mannheim Tel.: 0621 318 76 70
AKCAN 2 Bremen Tel.: 0421 691 96 78	LIZA GmbH Berlin Tel.: 030 61 62 98 11
CAN GETRÄNKE Essen Tel.: 0201 289 74 17-18	TRINK-One Düsseldorf Tel.: 0211 15 79 881
CAN GmbH 2 Köln Tel.: 0221 37 79 408	TRINK-SEM Dortmund Tel.: 0231 981 86 23



Bîranînek ji Moskowayê

Pîrkemal

Ez, Derwêş Ferho û Rojan Hazim li derê balafirgehê li bendî Zekar bûn. Piştî hatina Zekar em li trimbêla wî siwar bûn û me berê xwe da mala wî. Min di trimbêla wî de ji xwe re li Moskowayê temaşê dikir. Jiber ku di serê min de Rûsyaya berê diçû û dihat min digot qey emê rastî welatek yan jî bajarekî paşdemayî û kevnare bên. Lê Moskowaya ku min di serê xwe de çêkiribû û ya ku min didît ne wekhev bûn. Riyên firek û xweş, avaniyên bilind û nûjen, dikan û firosxaneyên mezin dimenên di serê min de parçe kir.

Zekar bixwe Ermeniyê Qamişlo bû û xanima wî jî keça Deranîk û Melanî bû. Wek me di nivîsên berê de jî behs kiribû, Deranîk û xanima xwe Melanî li Ermenîstanê, li gundê Çaransavanê diminin û em bi dilgermî kiribûn mēvanên xwe. Dê û bavê Zekar li Ermenîstanê dijin û tenê bi Kurdî diaxivin. Kurdiya Zekar jî pir xweş bû. Ew di 16 saliya xwe de ji Qamişlo derketibû lê Kurdiya xwe jibîr nekiribû. Gava me dipirsî "Zekar, te çawa Kurdî jibîr nekiriye?" ewî bi ken digot "dê û bavê min tenê Kurdî diaxivin, ma ezê çawa jibîr bikim!". Xanima Zekar û zarokên wî bi Kurdî nizanibûn, bi Ermenî û Rûsî diaxivin. Piştî xwarinê bi riya Derwêş Ferho me pismamê Îsko Dasenî li bajêr dît û me hev naskir. Ew bixwe jî jûrist bû û wek pismamê xwe Kurdperwerekî baş bû.

Wek me di nivîsarên berê de jî behs kiribû, Cemal Cindoyan bixwe li Moskowayê dima û jibo serdanekê hatibû Êrivanê. Jiber wê jî mala Cemal a li Moskowayê vala bû û Cemal xwestibû ku em li mala wî bimînin. Mifta xênî li cem kurê Cemal Rustem bû. Gava me Rustem naskir yekser diya wî Nazê hat berçavê min. Rustem li diya xwe Nazê çûbû û meriv digot qey te sêvek kiriye du qet, hevqasî ku dişibiyên hev. Rustem jî derhem ji dê û bavê xwe bernedabû. Wek wan merd, mēvanperwer, Kurd û xortekî xwenas bû. Bixwe Zanîngeha Rohhilatnasiyê qedandibû lê jiber tunebûna kar mecbûr bû ku bi riya dost û hogirên xwe bi bazirganiyê dakeve. Bi vî awayî em li mala Cemal Cindoyan bicîh bûn. Cemal Cindoyanê ku li Êrivanê mala xwe ji me re kiribû wek otêlê îcar li Moskowayê jî em şevder nehiştin û li vir jî mala xwe kir otêla razan û rehetiya me. Em carek din spasiyên xwe pêşkêşî malbata Cemal Cindoyan û dostên mîna wî dikin.

Her ku çû dostanî û germiya



navbera me û Zekar, Rustem û pismamê Îsko germtir bû. Hema bêje di hersê rojên li Moskowayê de roja ku me hevdu nedît tunebû. Em ji mēvanperwerî û qedirşinasiya xwe bêpar nehiştin. Me di van sê rojan de fersenda gera li seranserê Moskowayê nedît. Lê ya herî balkêş û navdar a ku ji me re meraq bû me dît. Ew jî Meydana Sor û

derûdora wê bû. Li gor hat gotin hejmara şênîyên (nifûsa) Moskowayê 12-13 milyon bû. Ev hejmar bi roj digiha heta bi 15 milyonî. Bajarekî mezin, nûjen û yek ji bajarên herî buha yê dinyayê bû. Jixwe gava meriv bar û gazînoyên qumarê didît û ew gazîno bi şewqa lempeyên reng-rengo dibiriqîn, meriv digot qey mero ne li Moskowayê lê li

Dallas yan jî li San Fransisko ye, hevqasî ku nûjen û balkêş bû. Min qet texmîn nedikir ku wê Moskowa wek bajarekî welatekî kapîtalîst hevqasî pêşkêşî û xweş be. Lê birastî bi dîtina Moskowayê min dev zimanê xwe kir û êdî min fêmkir ku piştî perestrojka û reformên Gorbaçov pir tişt li vî welatî hatine guherandin.

Meydana Sor di Rûsyaya û belkî jî li dinyayê meydanek herî navdar û herî paqij û xweş e. Avaniyên kevnare û spehî, dêrên reng-rengî û bilind xweşbûna Moskowayê zêdetir dikir û meriv heşmetkar dihişt. Jixwe xweşbûn û spehiya Meydana Sor kiribû ku Moskowa bibe yek ji serdanwarê tûristên biyanî û me di Moskowayê de bi zêdeyî tûristên biyanî dîtîn. Sedemek din a serdana Moskowayê jî mûzelîne Lenîna, mezelen (gorên) endamên politbüroya Partiya Kominîst a berê û mezelê Leşkerê Bênav bû. Tûristên ku me li Meydana Sor dîtîn hema bêje hemiyên serdana mûzelîne Lenîna dikirin û belkî jî bi vî dîtîne dema kominîstiya wan, tekoşîna wan û şoreşa 1917an dihat bîra wan. Em jî di nav de, ez bawerim ji şoreşa 1917an û heta niha rewşa Rûsyaya wek şerîta sinemê di ber çavên me û wan tûristan re derbas dibû.

Wek gellek tûristan em jî ketin dora serdana mûzelîne Lenîna. Me çente û telefonên xwe li emanetxanê hiştin û em derbasî mûzelîne bûn. Mûzelîne du qatan di binê erdê debû. Hemi bi kevirên mermer ên reş xemilandî bû. Em li dû hev di ber Lenîna re derbas bûn. Ew Lenîne go wextekî Rûsyaya û Dinyaya serû-

binê hev dikir di nava qefesek camkirî de razabû, ketibû xewek kûr û dûr. Ew Lenîne go me wek pêxemberekî jê re îbadet dikir bejinkurt û bedenjar (zeif) bû. Heçê nedîtibe wê bêje qey ew Lenîne deha wek çirokên dema Rustemê Zal bejinbilind, pêhlewana û wek dêwê heftserî ye. Bêguman Lenîna di dema xwe de di serê me gellekan de qehreman û pêhlewane azadîxwaz, rêberê gelên bindest bû, lê çi heyfe ku ked û daxwazên wî liber pêlên ava kapîtalîzmê herifî û bûn çirokên sedsalên pêşerojê.

Piştî em ji mûzelîne derketin, me emanetên xwe stendin û em hinekî din li Meydana Sor geriyên. Liber devê deriyê Meydana Sor Lenîna û Marx rûniştibûn. Heçê nizanîba wê gotiba Lenîna û Marx ji gora xwe rabûne û li ber devê derî nîqaşa Das Kapîtalê dikin. Di destê Lenîna de Pravda û di yê Marx de jî Das Kapîtal hebû. Birastî jî pir dişibiyên wan. Wek her tûristî me jî dimenê wan kişand û me 100 rûbilê xwe da. Xuyabû Marx û Lenîna jî ji teoriya xwe ya sosyalîzm û wekhevîyê ketibûn şikê û tēgihiştibûn ku bê pere, bê sermayê debar nabe, ewê ji birçîna bimrin. Jiber wê jî ew jî ketibûn nav refê kapîtalîstan û belkî jî jibo şoreşek nuh pere komdikirin.

Me bi xêra Enstîtuya Brukselê Moskowa, welatê Lenîna û meydana şoreşa 1917an jî dît û heger gotin di ciyê xwe debe me ew kul jî ji dilê xwe derxist. Di serdana Moskowayê de bû qismet ku em serdana Nûnerê YNK Şoreş Xalid (kurê Dr. Xalid) û Mala Kurda jî bikin. Şoreş Xalid xortekî şareza û tēgihiştî bû. Mala Kurda komela PKK bû. Wan jî em bi dilgermî pêşewazî kirin û em bi dilxweşî ji cem wan veqetiyên.

Sê rojên me zû derbasbûn, lê xweş derbasbûn. Em di 02.09.2005an de disa bi trimbêla Zekar hatin balafirgeha Moskowayê û em bê serêşandin derbasî hindur bûn. Herçiqaşî du polîsan xwestin bi mahna vîzê me bixapînin û perên zêde ji me bistînin jî, lê biserneketin. Balafira vê carê nûjen û xweş bû. Piraniya balafirên navxweyî kevn û jihevdeketî bûn. Lê xuyayê yên ku difiriyan Ewropa û derveyî Kafkasyayê nûjen û paqij bûn. Me bi dilekî şikestî dostên xwe li wir hiştin û piştî sê seet-sê seet û nivên li ezmana em li Brukselê peyabûn.

Em vegeriyên Ewropa. Heryekî ji me berê xwe da welatê xwe yê diduwan, welatê ku nivê emrê me, ciwaniya me xwariye û belkî ev welat me di axa xwe de jî veşêre!



Papa Benedîktî XVI serekî kurdistan Mesûd barzanî qebûl kerd


PK - Papa Benedictî 16 Vatîkan de serekî kurdistan Mesûd Barzanî û heyetî kurdistan qebûl kerd. Serekî hukmatî kurdistan Nêçirvan Barzanî zi bi.

No piyahetameyîş de Mesûd Barzanî halî mesihyanî kurdistan û iraq ser aghadarî da Vatîkan. Mesûd barzanî va; kurdistan semedî mesihyanî iraq yew cawo emîn o. Ê mesihî ke cayanî iraq ê binan de nêşkenî biciwî, ê yenî kurdistan de star benî. Destûrê iraq

de heqî piyerî dînan ameyo querî kerdiş, la destûrê kurdistan gereka hêna azadîwaşte bo.

Papa û ardimciyanî ey zi Barzanî re spas kerd ke hereketa kurd her tim mesihî querî kerdî û va; mesihî kurdiştan zaf baweriye xo birêz Barzanî anî û hevî kenî ke şima her tim inan querî bikerî.

Serekî kurdistan Mesûd Barzanî 11î teşrinê de zi Viyana de serekkomarî Avusturya Heinz Fischer'a amebi piye het.



Selim Çürükkaya

Eskerî tirkan û çawis Rîdda

Ê z wazena semedî Şemzînan çiy binusî. Şemzînan de bomba erziyay yew kitabxane, yew merdim kişiya. Şarî Şemzînan qetilkarî tepîşt û teslimî polisan kerdî.

Nika zi polis vîno ke çew ma dest de çîno. Eskerî û polis gêrenî nêşkenî qetilkaran bivînî.

Duyes serrî cuwa ver ez Lubnan de hepîxane de biya, qowîşê ma de yew çawîş bi, nameyî ey Rîdda bi. No yew çawîşo zaf pîs bi, o esilî xo Misir ra bi, mendiyen yew diêbî. Lewî ey gird bi, orteyî yew alişkê ey de yew leko yo sipye bi.

Her gure ti ra ûmeyn, puştê, dizdê, ti çiney vacî. Yew merdimî ey zi bi, nameyî ey Seîd bi. O zi sey kutikî çawîş bi. Ey şew û roj çawîş wasifnayn, çawîş zi nûnî ey dayn.

Yew roj yew miyerik tepîşiyab, no merdim ûme qowîş, çawîşî perê ciyebê ey de dî bi. Se ke miyerik kot ra, çawîş û Seîd perê miyerikî tirawitî.

Bi serî sibay miyerik warişt we, ey va:

Perê mi çînî

Wext ke çawîş pê na xeberî hesiya, o zaf yers bi, va:

Kam bînamus perê nê merdimî giroti? Lez vaciyen, nûn ez şima kuen

Çew vengî xo nêkerd, çawîş venda Seîdî da, va:

Seîd! lez serî piyerin bigêr, peranî no merdim vîn

Seîd gêra, gêra, la nêşka peran vîno. O merdim ke perê ey bibî vîn, o şî xeber da bînbaşî. Bînbaşî zi merdimî çawîşî bi, ê wîrd piya xebitiyayn. Bînbaşî û eskerî ûmê qowîş, ma piyer kerdî teber. Çawîş û Seîd zerre de mendî, ê gêrayî peran. Inan ke perê tirawitî ê bigerî peran, senî perê vîniyenî.

Nika na meselayî eskeranî tirkan a. Hîrê heb eskerî ûmê û bomba eşta yew dikan. Eskerî hê gêrenî eskeran. Inan ke bomba eşta dikanan, ê xo nêtepişen

Hewler de konferansa xoserbiyayîşî kurdistan viraziyay



Hewler - 10î teşrinê de serbajarî kurdistan Hewler de xoserbiyayîşî kurdistan ser yew konferans viraziyay.

Na konferans Kongreya Neteweyî ya Kurd li Amerikayê û Unîversîteyî Sela-heddîn piya organize kerd. Parçeyanî ciyaciya ê kurdistan re nunerî partîyan, PDK û YNK yew serekî parlamentoyî kurdistan, tayî parlamenterî kurd, zaningehani kurdistan re çend akademisyenî kurd na konferans de hedre bi.

Konferansê xoserbiyayîşî kurdistan de şart û şurtî xoserbiyayîşî kurdistan amê minaqêşa kerdiş. İta de şartî zerrî, yanî ê kurdan û kurdistan û him zi şartî teberî, yanî şartî dinya amê minaqêşa kerdiş.

Rojhelatî kurdistan de yew mala bi vîn

PK - Heftêkû viyert navçeyî Kirmanşan Serpêl-zehaw de malim Mala Behram Şahmiradî bi vîn û 10 malayî bîn zi amê zindan kerdiş.

Gorî agahdariyanî rojnameyî „Sîrwan“ ke bajarî Sîne de vîciyeno mala Behram Şahmiradî nimaja camiyê „Kûyek“ a pê bînate ra dariya we, bi vîn û 10 malayî bîn geriyayî zerre.

Nê malayî bisilmanî sunî yî û nê semed ke camî de xutbe wendo û no xutbe de hukmat rexne kerdo, ameyî guretiş.

Heyetî PKE mezeli Mala Mistefa barzanî ziyaret kerd

Barzan - Heyetî Platformî Kurdanî Ewropay (PKE) ke tede Aziz Aliş, Mihemed Ali Yildirim û Baran Boşkan ca genî 11î teşrinê de mezeli Mala Mistefa Barzanî û İdrîs barzanî ziyaret kerd. Inan yew tacagul mezeli Mala Mistefa Barzanî ser na rue.

Verfeki PKE Aziz Aliş İta de qisêkerdişî xo de va; “Halî kurdistan ewroyîn gorî xeyalê Mistefa Barzanî yo û kedê ey no hal de zaf o. No rid re zi ma mînettarî Mala Mistefa barzanî yî û ma ey her tim biyari vîri xo.

Heyetî PKE hefte ku viyert şî kurdistan û İta de dezgeyanî dew-



let û ê sivil ziyaret keno.

Yetîmxaneyî Meletî û raitîye tirkîya

Müdür Genç

Tirkîya de nê rojan herkes ho yetîmxaneyî şaristanî Meletî de işkence kerdişî qıcanî wırdıyan (qijikan) televizyonan-ra temaşe keno û sero mınaqêşa kenî. Bi raştî ê veynaye û resim qesebay merdim letê kenî. Ciniya weykerdox serê qıcan piye verdene, tas dana serê qıcan re, awa germ kena laşê qıcanê wırdikan re, ê deyax awa germ nêkenî têsêrd perenî, bermenî, qîrenî welakîn bêçare yî.

Yew mude cûwa ver Eskişehir de no qeyde yew problem veciya orte. Tikê xort û xebatkaran yetîmxaneyî tecawız kerdişî tîkê qıcan. O wext zî zaf mınaqêşe veraziya, cay tike qıcan bedelna û va ke ma problem çareser kerd.

Nika cay inan zî bedelnên û yew-di tene xebatkaran yetîmxaneyî ceza kenî û vanî ma meselay yetimxanî çareser kerd.

Yew mudirî emniyetî va, heta 40 serr ez nêftaya vace ez ke yetimxane de biyo pîl. Welakîn mi wexta televizyon de ne qıcı temaşe kerdî, qijekê mi amê mi vîr, ez xo ra şermayewa. Ez hama zî şew hewnê xo de kabûs veynena. Yew rojnamewan fikrê



deyirbaz (hünermend) Doguş persa. Ey fek xo xerepna, neng çinay xebatkaranî yetimxanî, ey va ke o wext ez zî tacîz kerda, ez hama zî şew kabûs veynena. Sey inan bi milyonan merdim nê yetimxanan ra vîyertî, ez bawer kena ke ê pêro hama zî hê kabûsan veyneni.

Esas mesela yew-dihebi cinî cezakerdiş niya, na mesela yetimxaneyî Meletî-û Eskişehir teyna zî niya. Na politikay dewleta tirk a, bi 80 serriyo pêro yetimxanan de na politika ramena, xeberê pêro burokrat, stiyasetkar, emniyet, mit û eskeriya tira esta.

Kadroyî dewleta taybet(özel) pêro nê yetimxanan ra veciyê.

Pêro yetimxanan de qıcı kerdî teslim insananî cahil, bêedeb û bêşiretan. Ê zî nê qıcan pê kûayiş, heqaret, ezîyet û işkence şîret kenî. Ê qıcı wexta ke benî pîl verba insan benî kindar, zerê nê qıcan de rehîm nêmanena

,bêbawerî û bêhîtbar benî. İnsan ra nefret kenî, her yew beno sê yew cinawir, benî dişmenî insanan û wexta mekteban de dersê nijatperestîyê zi girewt, insanan zaf talike û dişmen, dewlet zî may û pî veyneni. Ê insanan ra pawitişî dewlet xo re yew kar hesebnenî, çimkî may û pî inan dewlet a, insan niyî. Senî ke çew re merhemet nêveyna, çew re merhemet zi nêkenî. Nê qıcı wexta bi pîl tehsil xo qedna, miyan eskeriya, emniyet û istixbarat de çî genî, xebitiyeni.

Dewleta tirk kûrdistan de 30 serr yew şero qirêj ramit. Inan ke serê gerilla ci ra kerd pê poz da, lew, goş û vîni (zinc) a gerilla ci ra kerdî, kerdî kolye û koleksiyon, inan ke operasyonan de dewî şarî kird veşnayî, tecawız kerd cinian û kênekanî şarî kird, ê heme nê yetimxanan de bi pîl.

Heta nika no awa ameya, welakîn ewro ra pey no awa nêşino. Dewlet mecbûra yetimxanan islah bikero. Yan gereka merdimê ke weykerdişî qıcan sero pisporî(ekspert) inan bixebetnî, biyero standartanî ewropa yan zi ewropa serê inan ra war nîna.

Şemzînan de dewleta îlegal xo da dest



Şemzînan - Heftêkû vîyert navçeyî Çolemerg Şemzînan de roj nimajî nêmeroj dewleta îlegal yew kitabxane bomba kerd.

Neticeyî bomba kerdişî kitabxaneyî Hevî (Umut Kitabevi) Zahir Korkmaz û Ali Yılmaz merdî. La na ray dewleta îlegal nêşkay xo bixelisno. Bomba kerdişî kitabxaniya pey şarî Şemzînan nê merdimî zerrê erebeyî inan de tepîştî. No erebeyî JIT (Tewkîlatî istihbaratî Cendirme) bi û yew Renault 19 bî. Cuwa pey polesan astsubay Ali Kaya û Özcan İldeniz şarî dest ra vetî tê berdî. Zerrê erebî de 3 kaleşinkof, nexşî mintiqa, krokî û listeyî nameyî welatperweran bî.

Serleşkeriya tirkîya waharî nê

kesan veciyay. La serekwezîr R-Tayyib Erdogan va; „ ma gereka şima na pers ser, penî çî ra veciyena wa veciyo, ma gereka veranêdî“ Zafê analist îdia kenî ke ê teqayiş ke nê demp peyîn de benî, piyerî inan bi destî dewleta îlegal benî. Gereka biyayê Şemzînan sebeb bî ke failî nê biyayeyan biyerî eşkira kerdiş.

Wext ke dozgeriyê Cumhuriyet waşt ke îta de cigêrayiw virazo, yew erebe re gulê verradiyayî inan ser. Waharî erebeyî Tanju Çavuş tepişiya, hama ho binçiman de yo, la ê di astsubay serbest verradiyayî.

Per bin re şarî kurdistan Wan, Çolemerg, Gever û Amed de verba dewleta îlegal û samedî paştgirotişî warî Şemzînan mîtingî viraşt.

Heinz Fisher pêşwazî Celal Talebanî Kerd

Viyana - Serrekkomarî iraq Celal Talebanî gerayişî xo ê Avusturya de 14î teşrine de perî serekkomarî Avusturya Heinz Fisher re Hofburg de qesrê serekomariye de bi yew merasîme eskerî amê pêşwazî kerdiş.

Merasîmê eskeriya pê her di serekî şî zerrê Burghof. Celala Talebanî halî iraq ser agahdarî da Heinz Fischer. Cuwa pey her di serek samedî iraq de rueniştîşî demokrasî û verdşiyayişî aborî û sosyalî, rolî Avusturya ser vindertî.

Serekkomarî Iraq Celal Talebanî 15î teşrine de zi serekwezîrî Avusturya Wolfgang Schüssel a nişt rue.

Mesûd Barzanî û Nêçîrvan Barzanî zi 13ê teşrine de Viyana de Celal Talebanî ziyaret



kerd. Inan halî iraqo rojane û seferanî Mesûd Barzanî ê amerika û britanya ser sohbet kerd.

Dr. Roj Nûrî Şaweys: Lîsteyî îtifakî kurdistan her cayî kurdistan de bibo

Bexdat - Cagîrotê serekwezîrî iraq Dr. Roj Nûrî Şaweys 12î teşrine de buroyî xo de pêşwazî Kofi Enan kerd.

Kombiyayişî çapameniya pê Dr. Roj va: „ No ziyaretî birêz Kofi Enan nişan dano ke hin semdî Yewbiyayê Netewan iraq mûhim o. Ma no qisêkerdişî xo de prosesî vîcnayişî

iraq ser qisê kerd. Ma wazenî no vîcnayişî şefaf, azad û demokratîk bo“


Dr. Roj Nuri Şaweys listeyî kurdistan ser zi ina va ke listeyî îtifakî kurdistan wazeno bi heme hêzanî siyasî ê iraq a dîialog û mınaqêşayan bikero. Her ca ke kurd tede yî ê cayan de listeyî ma bibo.

بۆ پاراستنی فۆنه تیکی کوردی پيشنباری پیتی لاتینی دهکهم

نۆردوخانی جهليل کورنی نووسهري ناوداری گه له کهمان جاسمی جهليله و، له مابالتیکی دیاری کوردانی رووسیای و بنه مانه که بیان خزمه تیکی بهرچاوی بزانی روشنیری کوردییان کردوه، جاسمی جهليل یه کهم بهرینه بهری بهشی کوردی رادیوی یه ریشان بووه، پرۆفسور دکتور نۆردوخانی جهليل خاوهنی چه نلین کتیب و نووسینی دهگه نه له سه ر کیشی کورد و چاند و روشنیری کوردی، خوینده وارنکی به ناگای کورد نییه ناوکانی "جاسمی جهليل"، "نۆردوخانی جهليل"، "جهمیله جهليل" و "جهليلی جهليل" نه ناسیت و ناشانی نووسینه کانیان نه بیته.

نهو مرۆقه مه زنه تژییه له کوردیتی و دتی پر له هیوای نازادی و خهونی نهو پیشقه چووینی زیاتری دۆزی گه له که بهتی له گشت پارچه کاندایه گشتی و له باشووردا به تاییه تی.

له درهنگه شهوکی دهمو پایزی کوردستاندا له پیرامی هه میشه گه نجدا نه م دیمانه یه مان له گه ل نهو مرۆقه زانایه سازدا. هه قه پیه یین: نامق هه ورامی - هه ولیر



"گۆماری کوردی پشت قاقاز" دامه زرا و له ویدا قوتابخانه یه که هه بوو بۆ کور و کچ و گه و رهو بچووکان و کوردهکان له ویدا دهیانخویند و بایع من سه رۆکی نهو کۆماره بوو. له ئه رمه نستان دیسان له و ساته وهختانه دا کتیبی نه م نووسه رانه چاپ بوون "عه رهبی شه مز"، "ئه مینی عه قدا ل"، "حه جی جندی"، "ئه حمه دی میرازی"، "جاسمی جه لیل"، "عه تارێ شه رۆ"، پاش ئه وانیش نه وه یه کی تر په یدا بوون که بریتی بوون له "سه عید ئیبز"، "سمۆیی شه مز"، "کارایی چه چانی"، "فلکی وسف"، "توسنی ره شید" زیاتر و زیاتر بوون. سالی 1950 رادیوی کوردی له یه ریفان دهستی به کارکردن کرد و به مجۆره کاروانی روشنیری کوردی له وئی پیشه کهوت. دیمه وه سه ر وه لامی پرسپاره که، له سالی 1991 و پاش هه ره سی یه کتیبی سۆقییه ت هه موو نهو شتانهش رووخان و کورد له وئی زۆریکیان په ویان کرد له بهر سارد و سه ری و نه بوونی کارهبا و بۆیوی هه ر مالبات و هۆز و تاقمیک رووهو لایه که سه ری خۆیان هه لگرت و ولاتیان جیهنیش و نه وهش حالێ کوردهکانه له رووسیای، شه مرۆ نه قوتابخانه یان هیه و نه رۆژنامه، نه وهی ماوه ته وه شه مرۆ، کوردان له رووسیای تا که هیواییان پێ هه بیته هه ریبی کوردستانه و چاومان له وهیه نه م ولاته رۆژ له دوا ی رۆژ پێش بخه ن.

پ: له دهستوری رووسیادا کورده داناسریت؟
و: نا وهک میلله ت نایه نه ناسین، به لام وهک که لێ رووسی ده زانن که کورد خاوهنی چ کولتور و نه ده بیکی بالایه و له و ریکه یه وه پاش ده زانن کورد چیه. له کاتی دروستکردنی مۆسکۆدا پیکهاته یه که نهو شاره یان دروستکردوه که پێیان ده لێن بونیادی رووسی، له ناو ئه وانه دا هۆزیک هه بووه به ناوی "رووسۆفی" که نهو نازناوه تا ئیستا له نیو ئیزیدیییه کاندایه هیه له ئه رمه نستان، ئه مه نیشانه ی نزیکی کورد و سۆقییه تیه کانه.

پ: رادیوی یه ریفان ئیستا په خشی کوردی ماوه؟
و: ده مویت نه وه بلێم سالی 1950 کاتیک رادیوی کوردی له یه ریفان به بهرپاریکی فه رمی کرایه وه، سه ره تا هه قته ی 2 رۆژ بهرنامه مان هه بوو، هه ر بهرنامه یه که 15 خوله ک بوو، واته هه قته ی 45 دهقیقه. پاشان بووه نیو کاتمیز و له کاتی سه ردانی مه لا مسته فا بارزانی بۆ ئه رمه نستان بهرنامه بوویه 20 کاتمیز له رۆژیکدا. پاش هه لوه شانده وهی بۆ لایه رهی 8

له تورکیاوه هاتبوونه ئه رمه نستان به هۆی فیکردنی ئه رمه نه کانه وه. له ئه رمه نستانیش پێش نهو هاتنه ی کورد له تورکیاوه، کورد له وئی هه بوون. به پێی به لگه کان له سه ده ی ده یه ما کورد له ئه رمه نستان هه بوون، "چۆمی سیوان" که پێشتر ناوی "گۆچه" بووه که گونیکه و له وئی "دیر یکی مه سیحی هیه که چوار ده رگای هیه، یه کیک له ده رگاگان له سه ری نووسراوه "دیاری کوردهکانی تۆران" بۆ دیره که. دیاره نه م ده رگایه نه له میزدین و نه له دیاره که ره وه نه نیژدراوه، کوردانی ئه وئی دروستیان کردوه.

من گه رام له وئی کوردم نه بیینی، به لام له گه ل زۆریکا قسه م کردوه باسی بوونی کوردیان له ناوچه یه کردوه و ئیسته ش نازناوی کوردی له ویدا ماوه، به لام خه لکه که ده لێن ئه رمه نین. هه ره وها له ده ور به ری چپای "ئه له گه زه" ش کورد ژیاون، له ده ور به ری سه ری ئاوی ئاراس گوندی کوردان هه بوون له ناوچه ی "ئه ره په چه ک"، له بیرمه مندال بووم له گه ل باوکمه دا ده چووینه نهو ناوچه هه موویان کوردی ئیزیدی بوون له واته ش گوندهکانی "ته لک"، "هه کز"، "گه لتۆ"، "سابونچی"، "قزلا مارا" و... هندا که ئه مانه نزیکی 18 گوند ده بوون. له ده ور به ری "ئه له گه ز" له لای رۆژه لاته وه، له ویش نزیکی 16 گوند هه بوون که کوردی ئیزیدی بوون له واته ش "جه موشوانا مه زن"، "جه موشوانا بچوو ک"، "پاپا کوردا"، "ریبو غاس"، "جه رجه ریس"، "قنده ساز"، "میره کا مه زن"، "میره کا بچوو ک" له ده شتی "گریدا فی" له نزیکی شاری "هۆکتیم بیریا نه" ش کورد هه بوون.

دیمه وه سه ر کوردهکانی ئه رمه نستان، حکومه تی سۆقییه ت گه لێ شتی کرد، له ئه پریلی 1921، سۆقییه ت، ئه رمه نستان و ده رگرت له یه کتیبی سۆقییه تدا، له کاتدا وه زاره تی په ره و ده کتیبیکی ئه لفا یی کوردی چاپ کرد ناوی "شه مس، بوو. نه م کتیبه براده ریکه ئه رمه نی به ناوی "هه کۆپ غه زه لیان" ئاماده ی کردیوو. نه م مرۆقه خزمه تیکه باشی به زمانی کوردی کرد، سالی 1929 حکومه تی ئه رمه نستان بهرپاریادیوو پیتی لاتینی دروست بکرت بۆ کوردهکانی ئه رمه نستان. له و ساله دا پیتی نووی لاتینی له لایه ن "مه راکۆلف ئیسا هه ک" وه ئاماده کرا که خۆی ئاشووری بوو. سالی 1930 له یه ریفان

پ: بارووخی کوردان له رووسیادا چۆنه؟
و: بهر له وهی باسی بار و ژیانی کوردان له رووسیادا بکهین پینویسته ساتیک بۆ دواوه بگه رینه وه بۆ سه رده می یه کتیبی سۆقییه ت و له ویه ته ماشای ژیانی کوردان بکهین. وهک ده زانن کورد له ئه رمه نستان و جۆرجیا و قازاقستان و قرقیزستان ده ژیان، نهو کوردانه ی سالی 1927 له ولاتی خۆیان ده ربه ده ر کران له ئه رمه نستان بۆ سه ر سنووری ئازهر بایجان و ئه رمه نستان. کورد له تورکه نستانیش هه بوون، له وئی کوردهکان کوردی شیعه ن و به شیکن له کوردهکانی خۆراسان و قوچا. ژماره یان نه زانراوه، چونکه هه ندیکیان کوردن و خۆیان به کورد نه ناسیوه یان ژماره یان که مه. ئه وانه به کوردی ده ناخشن و کاتی خۆی زۆر پشتیوانی سۆقییه تیان ده کرد و له دامه زرانانی ده ولتی تورکه نستاندا، رۆلی کاریه ریان هه بوو و له و سه رده مه دا 2-3 کتیب له وئی ده رچوو به زمانی کوردی و بۆ فیزیووی ئه لفا یی کوردی، به لام دواتر کوردهکانی تورکه نستان له ناو تورکاندا ئه وانه وه و ئیستا زۆر که من.

له قازاقستان و قرقیزستانیش کورد هه ن و خۆیان به شانازییه وه به کورد ده زانن. سالی 1937 من چوومه لایان بۆ کۆکردنه وهی فۆلکلۆر، ئه وان وینه ی خویندواره کوردهکانیان نیشانام که له زانکۆدا ده خوینن له شاری "فرۆزه" و له و سه رده مه دا داویان دا بویه حکومه ت که به فه رمی کوردی بوونی ئه وان بناسیت. کوردهکانی ئه وئی، شه مرۆ به کوردی ده ناخشن و جلوبه رگی کوردی ده وێشن و دا بونه ریتی میلی کوردانه یان هیه. کۆمه له یه کیان دامه زران بووه به ناوی "کۆمه له ی کوردستان". "نادرۆف" خه لکی ئه ویه ی و له بواری زانستی نه وندا، په یه کی بالای هیه. کوردهکانی ئه وئی کتیب و رۆژنامه و گۆفار چاپ ده که ن به زمانی کوردی.

له قه قاز، کوردهکانی ئه ویش چالاکن و ئه وانه ی سه رده می کۆماری کوردستانی سورن که له نیوان قه ره باخ و ئه رمه نستاندا له شارهکانی "کله جار"، "لاچین" و "قه به رلی". ئه وان له سالی 1930 دا رۆژنامه ی کوردییان هه بووه به ناوی "کوردستانی سور". سالی 1931 کتیبیک له وئی چاپ کراوه به ناوی "کوردهکانی ئازهر بایجان" که به وری له ژیان و ژماره و هۆز و... هندی کوردهکانی ئازهر بایجان باس ده کات. گه لێ شاعیر و نووسه ری زۆر گه وره هه بوون که ئه سلیمان کورد بووه و نکۆلییان له کورد بوونی خۆیان نه کردوه. زستانی سالی 1959 "هه زاری" مه زن هاته رووسیای بۆ چاره سه ر. هه ر له و ماوه یه دا دیوانیکه هه زار وه رگێردا بویو به سه ر زمانی ئازهری و چاپکرا بویو. بۆیه له "باکۆ" دا وه ت کرا بۆ ریزلێتانه. من هاتمه لای هه زار له وئی، بۆنه که سازکرا و پاش خوارین و خوارده وه زۆریک له شاعیرانی مه زنی ئه وئی هاتنه لای هه زار و گوتیان ئیمه ش به نه چه مان کورده، دیاره نه م هه سه ته ش لای ئه وانه کاتیک دروست بوو که مه لا مسته فای بارزانی و هه قاله کانی هاتنه سۆقییه ت و ده نگه انه وهی گه رانه وهی بارزانی پاش شوهرشی 14 ته مووزی 1958 و پینشوازی کردنی له لایه ن قاسمه وه له میدیای رووسیادا رهنگی دا بوه، شه مه ش هۆکاری سه ره کی درکانندی نهو هه سه ته بوو لای کوردهکانی سۆقییه ت و ئیسته ش له وئی "ئه حمه دی" چه پۆ "رادیوی کوردی هیه و به کوردی بهرنامه په خش ده کات له "باکۆ" ژماره یه ک کتیبیش به کوردی چاپکراون.

له ئه رمه نستانیش کوردهکان ئه وانه ن که سالی



په یق

دهنگان به حیزیک یان لایه نیکه سیاسی بۆ ئه وهی بیته نویته ری میلله ت له ناو په رله ماندا، شتیکی هه روا ئاسان نیه، بگه رگرتن و چاره نووسه سازتورن هه نکاوه میلله تیک نه بیته و بریاری بۆ شه دات. بۆخۆم بۆ ئه وهی دهنگی خۆم به خشم و له هه لیزاردنه کانی کوردستاندا به شداری یه کهم ئه گه ر جاری پینشوو جاریک بیرم لیکردیته ره. ئه سجاره یان له وانه یه پینویست به وه بیته ده یان بیست جار بیری لیکه مه وه، چونکه نه زموونی پینشوو زۆر شتی روون کردوه. هه نکاوی یه کهم بوو له سه ر ریکه ی به دیموکراتیپورن و موماره سه ی راسته قینه ی سانی دهنگان به و مه رجه ی بزانی دهنگ به کی ده دین و بۆ ده یه مین، نهو کاته یه کهم جار بوو ده مانویست به هه ر شیوه یه ک بیته کورد بگاته په و پایه ی بهر له ناو عیرا قی نویدا. به لام نه زموونی ئه سجاره شتیکی تره، ئه سجاره هه مووان بیینی، کی خزمه تی کرد و کی نه کرد، کی شایسته ی ئه و دهنگ و کی شایسته ی نه بوو، من بۆ خۆم ئه سجاره هه روا ئاسان دهنگی خۆم نایه خشمه حیزیک نه گه ر نه زلم بۆ ده یه خشم و چیم ده ست نه که ویت...

ئه وهی هه موومان ئه زانی چینی که نه جان چینیکی زیندوو و ته ری ناو کۆمه لگایه، ئه وان ئه توان بریار بده ن سه یینی ئه بی رهنگی چۆن بیته. ئه وهی من تیبیبیم کردوه به موه لایه، جۆریکه له پینوایی له نیوان چینی که نه جانی کوردا، ده لێن گویا و چاره و ران ئه کۆرێ ژماره یه کی زۆریان به شداری نه که ن له پرۆسه ی هه لیزاردنه کانی داها توری عیرا قدا، ئه ره ش له پینواییانه له بهر امه ر حیزبه سیاسیه کوردیهکان و به تاییه ت هه ر دوو حیزبه ی گه وره ی ده سه لاتدار.

ئهو مه سه له یه زۆر له هه ل خۆ نه گرت، له وانه ئه وهی من ئاگا ریم هه تا ئیستا ریکه وتی راسته قینه و شه فاف به هیج شیوه یه ک نییه له نیوان ئه و دوو حیزبه یه. هه تا ئیستا نهو دوو لایاره یه به فیعلی یه کیان نه گرتوه، هه رچه نه واپیشان ئه دهن و له بهر ده م نه ته وه کانی ته ری عیرا قدا و ئه نوینن که ریکه وتوون به لام ئه وهی له پشت په رده وه روو ده دات و ئه و ته ریت و ئه پینریت شتیکی ئیجگار جیا وازه، ئه ره ش که هه تا ئیستا بۆته هۆی شکستی له هه ول و ته قه لاکان به ره زالیوون به سه ر حاله تی دا به شیوون له ته وینه ی کۆمه لگای کوردی له ناو کوردستان به ده ستیه وه نه ناییتیت

دیداری هه لکهوت زا هیر له گهل:

هونه رهند روژان

ملکهوت: ئەم کاتەت باش روژان خان. بە مەم زانی له کوردستان چارم پیت بکویت و، له نزیکه چەت پرسیاریکت ئاراسته بکەم.



روژان: بە زمانی فارسیش گۆرانم گۆرتووه بەلام ئەبەر ئەبوونی ئیچازه له ئێران گۆرانیه کاتم له ئەمریکا پلار گۆرتووه.

سەردانەم دەسکەوتیکی گەوره و خوینیکی مەزەم هاتە دی لەو سەردانەدا ئەوێش بەناسینی بەشیکێ ژۆر له هونەرماندان و، هەزێش دەگەم له باره مەکانی ئایندەم ناوازی تۆشی تێنایت.

ملکهوت: لەم سەردانەت بۆ کوردستان چەت باره مەت گۆمار کرد؟

روژان: لەم سەردانەم تۆنیم چوار کلیپ له گەل تەلەفۆنی مەزەم و پیک کلیپ له گەل KTV تۆمار بکەم.

ملکهوت: چۆن کاره هونەر مەکانی کوردستان مەبێت؟

روژان: کوردستان خاوەنی گەنجیەکی مۆزیک دۆله مەندە و، رەسەنایەتی پێوه دیاره و شینۆزی جیا جیا له کاره هونەر مەکاندا مەبینم و، هەنگاوی چاکتان هاوێشێوه و ئۆمیدوارم که هەمیشە له باره پێشێوه چوون باین.

ملکهوت: حەز له دەنگی کام گۆرانی بێژ دەکەیت؟

روژان: حەرم بە دەنگی خاتوو لێلا فاریقی یه بەتایبەتی گۆرانی "هەموو شەو" هەر هەموها دەنگی ئێبڕامیم تاتلساس و، گرووی کامکاران و دەنگی گۆره گۆرانی بێژی عەرب ئۆم کەسوم.

ملکهوت: ئۆمیت چەت بۆ گۆرانی بێژی ژنی کرد؟

روژان: دیاره ئەوهی له بەرچاوه ژنی کرد هەنگاوی چاکان ناره لەم باره و، هێوادارم که مەکارهکان به شیوهیکی کشتی زیاتر خورتر بکۆن بەتایبەتی له بواری هونەری چالاکر بێتە مەیان.

ملکهوت: پڕۆژە تازەم بڕیتە له هەشت بەرەم و بە چەت شینۆزیکێ زمان.

ملکهوت: ناوای سەرکەوتت بۆ دەگم.



خۆزسک کەمەندام بوون، بۆ ئەوهی بتوانن ناویەنار چالاک بۆ خۆیان ئەنجام بدەن و خۆزستی خۆیان بکۆن، یانە کوردی "میدیا" ش ئەو پەری پشنگیری خۆی بۆ پارمەتی دانایان دەربەری.

شایانی وتە "گاک شوان خەفاف" پری ۱۰۰ ئێرۆ بەخشی بە ئەمەنگە و مامۆستا "زگار پشەوری" ش بە گۆرانی ناسراوەکی "چەمبە" بەشداری ئەمەنگە کرد.

بە لای تیکرای ئامادەبوونی ئەم بۆتە هەسەرەنگ و هەمە لایەن، بووه زیاتر مایە خۆشەویستی و، بەتین بوون و بە هاناوچوونی پەکتی کۆمەگای کرد له نامۆی و ئاوارەیدا، بێگومان تیکرای هونەر مەکانیش به خۆبەخش بەشداری رازاندەوهی ئەمەنگەکیان کرد. بۆ و بە خۆشەویستی هۆله گەیان بە جێنیت. ■■■

ئەز نه پۆله تیک هاتمه، ئەز وهما هاتیمه کوردستانی بێبم، ئەز چومه هەموو ئالایان ئەز چومه بارزان ژێ، ئەز چومه هەلەبە ژێ، هەروەسا پارەمانتا کوردستانی.

ئەگەر ئەز نەشائش بێم ته گوت، چارا ئیکێ یه پشتی ۲۰ سالۆ تو دێت کوردستان، پشتی فان هەمی سالۆن فان هەمی گۆمەرتتا، ئەو رەوش چارا دینی؟ ئەز پەر کەیفێش بووم، ئێرۆ من کوردستان دیت ئازاده، عەرەب نین، تو لکو دنیزی ئالا کوردانی، ئەفە ژێ ژبۆ کوردیا تەشتەکی دێزکیه، هەتا نەها ئێرۆ تەشتی وهسا چی نەبووه. ■■■

له "گەستەفەین"ی هۆلەندا

بۆ یارمەتی به کەمەندانمانی کوردستان ئەهنگی "میدیا" به سەر کەوتووی بەرپۆه چوو

سەرمار فەتاح - مۆلەندا - رۆژی یەکشەمی ریکەوتی ۲۰/۰۵/۱۱/۱۲ کانزیمیر پینچی ئیواره تا دەی شەو، یانە کوردی "میدیا" له ئەمستردام، بە ماریکاری چەت ریکارویکی هۆلەندی یارمەتیدەری کەمەندانمان، ئەهنگیکی گۆرانی و مۆسیقای کوردی پەرچەش و خۆزشیان ساز کرد، که چەماوەریکی زۆری هۆلەندی و کوردی دانیشتی ئەمستردام و دەورەپەری به تەمەرزۆنیوه پیشوازیان لیکرد.

ئەم کەس و تێپاە له ئامادەکردن و رازاندەوهی ئەمەنگەکیا بەشداریان تێپا کرد. بۆ: بێزکە ئەم ئەهنگ بەرپۆزێن "ئاراس جاف" و "مەهاباد خان"ی هاوسەری دەگەرتیوه، که خۆی کەسایەتییهکی بەوه و بە توانایه و له ناوەراستی هەشتاکاوه، کەمەندام بووه، بەرپۆزی پیشناری بۆ یانە کوردی "میدیا" کرد له ئەمستردام، که چالاکیهک ئەنجام بەن و سوورەنگی بۆ کەمەندانانی کوردستان بکەرتیوه. لێژته سەرپەرشتی و کارمەند ئەندانانی "میدیا" ش به خۆشحالیوه پیشوازیان لەم بێزکەپه

فیزای ئێران له رینگای تارانه وه

NEW PLAN تۆریستی

کوردستان له رینگای تارانه وه

فیزای ئێران بۆ خیزانی پتر له سێ کەس / ۱۲۰ / کەس

لیتیا بۆ سەر تاسەری جیهان
"عەرە" تاران
Thomas-Mann Str, 24
53111 Bonn
Germany
Tel.: 0049 (228) 180 24 34
Fax: 0049 (228) 180 24 38
E-Mail: info@newplan-travel.de
www.newplan-travel.de

لیتیا بۆ

سەر تاسەری جیهان

Germany

Tel.: 0049 (228) 180 24 34

Fax: 0049 (228) 180 24 38

E-Mail: info@newplan-travel.de

www.newplan-travel.de

دکتور شیرزاد نهجار راویژکاری سهروکی حکومتی کوردستان:

عیراق سی پارچهیه و هیچکامیان پیوهندیان بهیه کهوه نییه و ئەمەش سەرەتای هه‌لوه‌شاندنه‌وه‌یه

• پرۆسه‌ی پارچه کردنی عیراق لاسهر ناستی تیوری و لاسهر ناستی پراکتیکی پرۆژه‌یه‌کی کۆنه
• دیموکراسیه‌ت پیویستی به دهسه‌لاتی دیموکراسی هه‌یه تا بتوانیت کۆمه‌لگه بهو ناراسته‌یه‌دا
به‌ریت و له هه‌زری هاوولاتیاندا نهو چه‌مکه بچه‌سه‌پیت



پاش ئەو گۆرانکاریانەی له عیراقدا رویانداوه له نیسانی ٢٠٠٢ وه تا ئەمڕۆ، بارودۆختیکی ناسه‌قامگیری له ناوچه‌که‌دا دروست کردوه و، زۆریک لیکدانه‌وه‌ی جۆراوجۆر بۆ بارودۆخه‌که‌ ده‌کریت. ئایا عیراق و ناوچه‌که‌ پاش ئەم روداوانه به‌کۆی ده‌گات؟
ئایا ئەم گۆرانکاریانیه به‌شیکن له پرۆژی رۆژه‌لاتی ناوینی گه‌وره، یان روداوکی کتویر بو و ده‌بوايه له ساته‌وه‌ختیکی خیرادا نه‌نجام بدریت؟
ناکه‌مکانی ئەم گۆرانکاریانیه چین و پاش پرۆسه‌ی ده‌نگدان لاسهر ره‌ش‌نوسی ده‌ستوری هه‌میشه‌یی عیراق ئایا گرتی کۆیره‌کان ده‌کریته‌وه، یان دۆخه‌که‌ ناوۆزتر ده‌بیت و، نه‌گه‌ره‌کانی گه‌رت بوونی عیراق زیاتر ده‌ین؟
بۆ گه‌توگۆ لاسهر ئەم باب‌ه‌تانه به‌ریز دکتور شیرزاد نه‌جار راویژکاری سه‌روکی حکومتی کوردستان بۆخویندی بالامان هه‌نایه‌ ناخاقتن.
سازدانی گه‌توگۆ چنار نامق

واته ئەو چه‌مکه کاتیک دیته رۆژه‌لات و پرۆژه‌لاتی ناوه‌راست چه‌مکیکی هاورده‌یه و تنها ده‌سته بۆی ته‌نزیری بۆ ده‌کات نه‌که‌رچی له‌وانه‌یه زۆریه‌شی باوه‌ری یه نه‌بیت چونکه ئەو ته‌نزیره له نیو عه‌قلیه‌تی کۆمه‌لگه سونه‌تییه‌کانی رۆژه‌لاتی نه‌چه‌سه‌پاوه و، پیویستی به کاتیکی زیاد هه‌یه، چونکه پرۆسه‌یه‌کی له‌و جۆره له‌کۆمه‌لگه‌یه‌کی کلاسیکیدا به‌و ئاسانه‌یه ناچه‌سه‌پ، ئیدی ئەم له ولاتانی عه‌ره‌یی بیت یان له‌عیراق یان له ئێران یان له ئه‌فغانستان. ئەم مه‌سه‌له‌یه مه‌سه‌له‌یه‌کی گه‌وره‌یه. راسته له‌رووی تیورییه‌وه گه‌توگۆ ده‌کریت، به‌لام له ره‌وشتی کۆمه‌لگه و هاوولاتیاندا

نیستا هه‌یه هه‌له‌وه‌شیته‌وه. له‌م پرۆسه‌یه‌دا عیراقیه‌کان له‌به‌رده‌م دوریانی به‌لێ و نه‌خیزدا بوون. ئەم‌مه‌ش هاوکیشه‌یه‌کی سه‌خت و گه‌رنگ و چاره‌نووس‌ساز بوو، چونکه بۆ ئەم قۆناغه‌ی ئیستای عیراق که جیاوازی ئایینی و ئیقتی تیندایه و، مانه‌وه‌ی عیراق وه‌ک ده‌وله‌تیکه‌ی به‌گه‌رتوو زۆر ئه‌سته‌مه چونکه ئەوانه‌ی ده‌لێن به‌لێ، رووبه‌رووی ناره‌زایی ده‌بنه‌وه، وه‌ک چۆن ئەوانه‌ی ده‌لێن نه‌خیز، تووشی هه‌مان ناره‌زایی ده‌بنه‌وه چونکه هه‌ردوو ئاراسته‌که هه‌یزیان هه‌یه، به‌لام لایه‌نی یه‌که‌م که کورد و شیععه‌ن ئەوان به‌هه‌زترین و زۆرترین رێژه‌یان هه‌یه، به‌لام نا‌کریت لایه‌نی دووهم که سونه‌ته‌ به‌له‌ییر بکه‌ین چونکه پش‌تیوانی ناسیۆنالیستی عه‌ره‌بیان هه‌یه، واته نه (به‌لێ) و نه (نه‌خیز) ناتوانیت سه‌قامگیری‌ه‌ک و گه‌ره‌نتیه‌یه‌کی باش بۆ بارودۆخی عیراق ده‌سته‌به‌ر بکات.

پ: پیتان وانیه ئەمه سه‌ره‌تای ئەو پرۆژه پش‌توه‌خته بیت که باسی لیده‌کریت له‌م پرۆژه پارچه‌کردنی عیراق، یان وه‌ک ئه‌وه‌ی هه‌ندیک لایه‌نی عه‌ره‌بی ترسیان لیتش‌توه؟
و: کاتیک باس له‌هه‌له‌وه‌شاندنی عیراق ده‌کریت له‌و ئاراسته‌یه‌وه ته‌ماشای ده‌کریت که ئەم‌ڕۆ له عیراقدا ده‌بینیت چونکه عیراق سی پارچه‌یه و هیچ کام له‌و پارچانه په‌یوه‌ندیان به‌یه‌که‌وه نییه، هه‌زکاری ئەمه‌ش نه‌بوونی حکومه‌تیکه‌ی به‌هه‌یزه که بتوانیت ئیراده‌ی خۆی وه‌ک ده‌وله‌تیکه‌ی مه‌رکزه‌ی یان فیدرالی بچه‌سه‌پیت.
مه‌سه‌له‌ی پارچه‌کردنی عیراق


پیویستی به‌کات هه‌یه بۆ ئەوه‌ی بچه‌سه‌پیت ئەو چه‌سه‌پاندنه‌ش پیویستی به‌زه‌مه‌ینه‌سازی هه‌یه. تا ئیستا سه‌قامگیری دیموکراسی له ئەلمانیا نه‌روویج و سوید و، زۆر جیکه‌ی ئه‌وروپادا به‌ته‌واوی نییه، کاتیک ده‌کوتریت کورد، پش‌ته‌نگه‌ له ناوچه‌که‌دا بۆ دیموکراسیه‌ت، ئەوه‌ گه‌وره‌کردنی رۆلی کورده، ده‌نا‌کوردیش به‌شیکه‌ له گه‌لاتی رۆژه‌لات له‌ رووی داب بکریت و بچه‌سه‌پیت.

پ: ئەم گۆرانکاریانیه به‌شیکن له پرۆژه‌ی رۆژه‌لاتی ناوه‌راستی گه‌وره؟
و: پرۆژه‌ی رۆژه‌لاتی ناوه‌راستی که سالی ٢٠٠١ له‌لایه‌ن ئەمه‌ریکاوه بلاو کرایه‌وه؛ تیندا هاتوه: پیویسته، بۆ چه‌سه‌پاندنی ئەو پرۆسه‌یه، دیموکراسیه‌ت له رۆژه‌لاتی ناوه‌راستدا له ریکه‌ی فیکردنه‌وه بلاو بکریته‌وه.

به‌لام ئەوه‌مان له بیر نه‌چێ ٤٠٪ بۆ سه‌ره‌وه‌ی ئەو کۆمه‌لگایانه نه‌خوینده‌وارن، بۆیه سه‌ره‌تا ده‌بی پرۆسه‌ی وشیار کردنه‌وه‌ی کۆمه‌لگا و، سیستی خویندن و فیکر کردن گه‌شه‌ی پیندریت.

دیاره پرۆژه‌ی رۆژه‌لاتی گه‌وره بۆ به‌رژه‌وه‌ندی ئەمه‌ریکا به‌ناوچه‌که‌دا و ئەو گۆرانیه‌ی ئەم‌ڕۆ له عیراقدا هه‌یه به‌شیکه له‌و پرۆسه‌یه‌ی ئەمه‌ریکا. ئەمه‌ش کاریکێ ئاسان نییه چونکه ئەو پرۆسه‌یه ته‌نیا له‌ناو ده‌سه‌لاتی گۆرانکاری ناکات بگه‌ ده‌بیت دابه‌زیته‌ ناو ته‌واوی ناسته‌کانی ژیان له‌ رووی ئابووی و فله‌سه‌فی و کۆمه‌لایه‌تییه‌وه. واته رۆژه‌لاتی ناوه‌راستی گه‌وره به‌وه درووشت ناییت که سیستیکی شمولی دیکتاتۆری بگزی‌ت و ده‌سه‌لاتیکه‌ی تر له جیکه‌ی دابنریت. ■■■

به‌مه‌به‌ستی بانگه‌شه‌کردنی لایه‌نه سیاسییه کوردیه‌کانی دیکه‌ی باکوور بۆ پیکه‌ینانی به‌ریه‌یه‌کی نه‌ته‌وه‌یی سه‌رکردایه‌تی هه‌ردوو پارتی PDK و PSK ی باکوور کۆریکی فراوانی هاوبه‌شیان له ئەلمانیا سازدا



“ئیماز چامپینال” به‌ ناوی PSK و “بایرام ئه‌یاز” به‌ ناوی PDK ی باکوور و تاربان ناراسته‌ی ناماده‌بووانی کۆریکه‌ کرد

ناماده‌بووان به‌ خوله‌کیک بۆ گیانی پاک‌ی شه‌هیدانی کوردستان راه‌وستان ئینجا، “ئیماز چامپینال” به‌ ناوی PSK و تاریکی ناراسته‌ی ناماده‌بووان کرد و گووتی: به‌خه‌یر هاتنی هه‌موو لایه‌ک ده‌کهم دیاره ئەم کۆریه‌ی ئەم‌ڕۆمان تابه‌ته به‌و پڕۆتۆکۆله‌ی که له نیوان PSK و PDK هاتۆته مۆرکردن و لێزدا ده‌خوایین به‌ هه‌موومان که ئەم پڕۆتۆکۆله به‌یه‌که‌وه

لوتمان به‌رزه‌جی Wuppertal. به‌هه‌ستیکی به‌رپرسییه‌تی نه‌ته‌وایه‌تی ئەو قۆناغه‌ی میژویه‌ی گه‌رگه‌ی که‌ له‌ کوردستان پیندا تیده‌په‌ری و، خۆگنجان له‌گه‌ل ئەو گۆرانکاریانیه‌ی له جیهان و رۆژه‌لاتی ناوه‌راستدا رووده‌دن و، بۆ زیاتر له یه‌ک نزیک بوونه‌وه‌ی پارتی کوردستانیه‌کان به‌ ده‌ستپش‌تخه‌رییه‌کی دلسۆزانه بۆ زیاتر گه‌شه‌کردن و به‌ره‌و پش‌ته‌وه‌ی چوونی بزافی رزگاریخوازی گه‌لی کوردستان له باکوور، کاتژمێری ١٢/١١/٢٠٠٥ یه‌رۆی ١١/١٢ ی ئەم مانگه و له هه‌زلی “Alte Feuerwache” له شاری “Wuppertal” ی ئەلمانیا، به‌ ناماده‌بوونی به‌شیک له سه‌رکردایه‌تی پارتی دیموکراتی کوردستان (PDK) ی باکوور و پارتی سوسیالستی کوردستان (PSK) ی باکوور و چه‌ماوه‌ریکی زۆر له ولاتێزێزان و رووناکییرانی کورد. هه‌ردوو پارتی ناوبراو کۆریکی هاوبه‌ش فراوانیان سازدا به‌ مه‌به‌ستی روونکردنه‌وه‌ی ئەو هه‌زکارانه‌ی بوونه‌ته رێخۆشکه‌ر بۆ له یه‌که‌گه‌یشتی هه‌ردوو سه‌رکردایه‌تی به‌ مه‌به‌ستی بانگه‌شه‌کردنی لایه‌نه سیاسییه کوردیه‌کانی دیکه‌ی باکوور بۆ پیکه‌ینانی به‌ریه‌یه‌کی نه‌ته‌وه‌یی فراوان و، گونجاو به‌سیاسه‌تی ئەم‌ڕۆی جیهان. سه‌ره‌تا

ووچامان له پیتاوی یه‌کیتیدا کرد بگه‌ ئیمه به‌و کاره‌مان هه‌موو لایه‌کان گێژ کرد هه‌رچه‌نده هه‌نگاوی زۆرمان بۆ هاوینشت به‌لام مه‌خابن هه‌وله‌کانمان سه‌ر نه‌که‌وتن. لێزه‌دا ده‌بیت پرسیاریک له‌ خۆمان بکه‌یه‌ن و زۆر جوامێزانه وه‌لامیشی بده‌ینه‌وه و، بلێن ئایا ئەو هه‌زکارانه چی‌بوون که ئیمه نه‌مانتوانی له‌م ماوه‌ دور و درێژه‌دا ریزه‌کانمان یه‌که‌بێن؟ بۆ لایه‌ره‌ی

PEYAMÎ Kurd

Jimare 63 | Sallî 2 | 18.11.2005

Rojnameyekî heftaney gistiye

Dr. Şêrzad Nekar:
Êraq sê parçeye
û hîçkamyân
pêwendiyân beyekewe
niye û emeş seretay
helweşandinewe

Laperey 3



Kuştinî kurdek le "Şemzînan" Bakûrî Kurdistanî hejand!

Laperey2

به مههستی بانگه شه کردنی لایه نه
سیاسیه کوردیه کانی دیکه ی باکوور بو
پینکینانی به ره یه کی نه ته وه بی
سه ر کردایه تی هه ردوو پارتی
PDK و PSK ی باکوور
کۆریکی فراوانی هاوبه شیان
له ئەلمانیا سازدا
لاپه رهی ۳

دیار مه لا کچه

کاریگه ری توندوتیژی
له سه ر ده روونی ئافره ت
لاپه رهی ۴

شینۆس فایه ق

قسه له سه ر هه لبژاردنه کانی
داهاتووی عیراق
لاپه رهی ۶

ئۆردوخانی جه لیل:
بو پاراستنی فۆنه تیکی کوردی
پیشنیاری پیتی لاتینی ده که م
لاپه رهی ۶

له ئه رشقی هونه رمه ندانی کوردستانه وه ..

هونه رمه ندی شیوه کاری
کۆچ کردوو "سه ره وه ت"
ئه نوهر سه وه ز
لاپه رهی ۷

دیداری هه لکه وت زا هیر له کدل:

هونه رمه ند روژان

لاپه رهی ۵

Le konferansî serbexoyî Kurdistan:
Emro serbexoyî xwastî
zorîney xelkî Kurdistanane

Laperey 2

